www.arsivakurdi.org

### Iraq li hemberî PKK'ê şer nake

■ Serokwezîrê Iraqê Haydar Ebadî bi Komîsyona Parastin û Ewlekariyê ya Iraqê re civînek li dar xist. Ebadî di vê civînê de got ku Tirkiye û Hewlêr ji PKK'ê ditirsin. Ebadî da zanîn ku li dijî PKK'ê şer nakin û ji bo êzidiyan astengiyan dernaxin... RÛPEL -4

# Êrîş rastî Xezeba Firatê hat

**Çeteyên DAIŞ'ê erîşî gundê Odyan ê Reqqayê kir. Ev êrîş ji aliyê şervanên Pêngava Xezeba Firatê ve hat têkbirin**

● Şervanên Odeya Çalakiyan a Pêngava Xezeba Firatê derbên giran li çeteyan dixin. Şervanan herî dawî 45 gund û 20 gundik rizgar kirin. Çeteyên DAIŞ'ê erîşî gundê Odyan ê Reqqayê kir. Êrîşa çeteyan hat şikandin û bi dehan çete hatin kuştin... R - 5

ROJEVA Medya

16 Çile Duşem 2017 / e-mail: rojevamedya@hotmail.com / Buha: 1 TL Hejmar: 67



### Gelê Minbicê dewleta tirk şermezar kir

Pêkhateyên bajarê Minbicê êrîşên dewleta tirk a dagirker û binpêkirinên wê yên li dijî mafên gelê herêmê şermezar kirin. Gelê Minbicê diyar kir ku kiryarên Tirkiyeyê ji yên DAIŞ`ê xerabitir in... RÛPEL - 5



## Avakirina Kongreya Star hat pîrozkirin

Li rojavayê Kurdistanê avakirina Kongreya Star hat pîrozkirin. Li taxa Şêxmeqsûd a Helebê bi dirûşma 'Jina zana bingeha avakirina civaka demokratîk e' yekemîn konferansa Kongreya Star hate lidarxistin. Berdevka Kongreya Star Evîn Siwêd destnîşan kir ku Kongreya Star sîwana karê xwe firehtir dike...

Medya Rûpel - 5



## Eke kurdî bibî yewe azad benî

Serekê Pêroyî yê OSPyî Sînan Çiftyurekî bale ant muhîmîya Kongreya Neteweyî ya Kurde ser û wina va: "Nika wext wextê wayîrvejîyayîşê her çar parçeyê Kurdistanî yo û ganî ma nê firsendî nêremnî. Eke kurdî aqilêko ortax awan bikerî, o wext heme problemî yenî çareserkerdiş."...

Medya Rûpel -11



## Helbestvanê rexnegir: Şêx Rizayê Talebanî

Şêx Rizayê Talebanî di helbestên xwe yên rexneyî de gotin û peyvên herî mustehcen bi kar anîne. Çi rayedarên hikumetê û çi jî mirovên wî bi xwe bin, kê neheqî yan xetayek li dij wî yan jî li dijî gel kiribe, Şêx Riza bi hîcîv û rexneyên xwe çûye ser wan. Şêx Rizayê Talebanî kurê Şêx Evdirehman Talebanî ye...

Medya Rûpel - 9

### Li Girava Îmraliyê hemû hiqûq tên binpêkirin, tecrîd veguheriye îşkenceyê û CPT li îşkenceyê temaşe dike

# CPT erka xwe bi cih nayne




Kurdistanî ji bo azadiya Ocalan meşiyan.... R.7

### TECRÎD KAOSÊ MEZINTIR DIKE

18 sal in Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan bi tecrîdeke giran re rû bi rû ye. 6 sal in parêzerên Ocalan û malbat nikare biçin hevdîtina Ocalan.

Parêzera Ocalan Newroz Ûysal diyar kir ku tecrîda li ser Ocalan roj bi roj girantir dibe û tecrîd dibe sedema giranbûna şer û mezinbûna kaosê.

### LI ÎMRALIYÊ ÎŞKENCEYA MEZIN

Newroz Uysal anî ziman ku dema mijar Ocalan be hiqûqa neteweyî û navneteweyî hemû tên binpêkirin û bal kişand ser bêdengiya saziyên navneteweyî.

Uysal bangî CPT'ê kir û wiha got: "Hemû mafên Ocalan tên binpêkirin û erka CPT'ê ew e ku îşkenceyê bi dawî bike. Îşkenceya herî mezin li Îmraliyê pêk tê."... RÛPEL/7

**› Portreya dîktatoran û Erdogan... Nivîsa Mihyedîn Melko** R7

# Dê ji dîktatoriyê re bibêjin: NA

Parlamentera HDP'ê ya Stenbolê Filîz Kerestecîoglu bertek nîşanî pêşûmeya guherandina makeqanûnê da û diyar kir ku Tirkiye roj bi roj ber bi rejîmeke otorîter ve diçe û dê ji dîktatoriyê re bibêjin na... *RÛPEL - 6*



### Êzidî: Derketina PKK'ê derketina me ye

**Êzidiyên li Şengalê diyar kir ku derketina PKK'ê ji Şengalê dê bibe destpêka qirkirineke nû û got ku derketina PKK'ê derketina wan e.**

**Welatiyê bi navê Salih Silêman wiha got: "Berî ku PDK ji PKK'ê re bibêje ji Şengalê derkeve, bila ew derkeve, ya esas em wan qebûl nakin."... R-7**

## Çîroka jinên Rojhilat

■ Gerîlaya YJA Starê Dîcle Rojhilat da zanîn ku çîroka wê, çîroka jinên Rojhilat e û wiha got: "Ji bo jinan, her cihê ku lê ne divê bibe qada têkoşîna azadiyê û berxwedanê."... R.2

## 'Ez do rayîrê Sara de şêra'

■ Gerîlaya YJA Stare Ezda Rojhate Colemêrg de yena dinya û dima ra zext û zordarîyan ver beşdarê gerîla bena. Gerîla Rojhate wina vana: "PKK ruhê merdimî ganî keno."... R - 11

Jin

## Sîwana karê xwe firehtir dike

**BERDEVKA KONGREYA STAR** Evîn Siwêd der barê xebatên kongreyê de nirxandin kir û li dîroka têkoşîna jinan li Rojava û birêxistinbûna wê di bin bane Yekitiya Star de bi bîr xist û wiha axivî: "Di sala 2005'an de Yekitiya Star di nava jinên kurd ên li rojavayê Kurdistanê de tê dikoşiya. Lê piştî şoreşa Rojava û avakirina Rêveberiya Xweseriya Demokratîk, pêwîstî hat dîtin ku Yekitiya Star sîwana birêxistibûna xwe firehtir bike ji bo ku hemû jinan di nava xwe de bihewîne. Lewma navê wê ji Yekitiyê veguherî kongreyê. Ev yek jî bo rêxistin û perwerdekirina jinan gaveke girîng e." QAMIŞLO





# Çîroka wê çîroka jinên Rojhilat e

**Gerîlaya YJA Starê Dîcle Rojhilat da zanîn ku çîroka wê, çîroka jinên Rojhilat e û wiha got: "Ji bo jinan, her cihê ku lê ne, her dema di nav de dijîn divê bibin qada têkoşîna azadiyê û berxwedanê."**

Dîcle Rojhilat di sala 1989'an de li bajarê Kotol ê rojhilatê Kurdistanê ji dayik bû. Ji ber ku malbata wê koçer e, Tevgera Azadiyê ya Kurdistanê ji nêz ve nas dike. Hê di zarokatiya xwe de xwest tev li nava refên gerîla bibe. Dema malbata wê bi vê dihese, wê bi xizmê wê Xoşmêr re dizewicîne. Zewaca wê 7 salan dewam dike. Keçeke wan bi navê Mîtra ji dayik dibe. Lê belê nikare li pêşberî zextên sîstema Îranê îdare bike û di sala 2009'an de tevî hevjinê xwe tev li nava refên gerîla dibin.

Gerîla Dîcle da zanîn ku li Îranê jin mîna ku ne mirov bin tên dîtin û wiha got: "Polîtîkayên tund û zexel ên rejîma Îranê ji her alî ve bandor li rojhilatê Kurdistanê jî dikir. Jin êdî naxwazin bi pergala Îranê bijîn lê ji neçarî nikarin dengê xwe bilind bikin. Li dijî vê pergala çewisandinê min berê xwe herî dawî da nava refên gerîla. Di nava malbata me de, tenê ez tev li nava refên gerîla nebûme, birayekî min ê bi navê Şiyar Kotol di sala 1999'an de piştî Komploya Navneteweyî ya li dijî Rêberê me tev li nava refên gerîla bû. Zewicî bû û zarokên wî jî hebûn." Dîcleyê axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Lêgerîna azadiyê ya hemû jinan heye. Di nava helwdanekê de ne. Ji ber ku hemû jin aciz in ku mehkûmî jiyaneke koledariyê hatine hiştin. Dê vê jiyanê qebûl nekin. Lewma divê li benda kesî nesekinin ku bê bi destê wan bigire. Ev şaşiyek e. Ya ku pêkhatina wê ne pêkan e, tenê xeyal e. Lazim e sînorên cih û demê ji bo têkoşîna jinan tune



bin. Bila bi têkoşîna me ya azadiyê piştrast bin. Ji bo azadiyê divê her jinek gavekê biavêje. Têkoşîna ji bo xwe û ji bo zarokan, ji her tiştî girîngtir e." *BEHDÎNAN - ANF*

## Tenduristî yanî parastin

Hemin em ketine sala nû, reng e ku em li ser parastin û xweparastinê bifikirin û nişangeha xwe diyar bikin. Lewma heke em vê yekê nekin dê wekî mînaka serkeftina 7'ê Hezîranê encamên windaker derkevin pêşiya me. Ango bi qasî serkeftinê, parastina wê jî pêwîst e yan na, wekî vê mînaka me diz û keftar ji destan direvînin dibin û li cihê wê poşmanî, rexne û gazinan dihêlin. Ji ber vê rastiyê parastina makro û mîkro divê bi hev re be. Kes çi qas bikare xwe biparêze civak jî ew qas xwe diparêze, asta kesan dibe ya civakê, ya civakê jî dibe ya kesan. Li gorî vê, mînak; em wek kes çi qas dikarin tenduristiya xwe ya kesane biparêzin, bibin bijîşkê/a xwe. Hema bi çavkorî xwe neavêjin ber destên bijîşk û dermanxaneyên çerxa kapîtalîst ku ji sîmsar û neyaran xerabtir in. Dixwazin em timî di nav lepên wan dermanxane û psîkologên (derûnnas) wan de bin. Jixwe pergala zordestiyê xwe li ser 'sê xaneyan' dide jiyandin; girtîgeh, şêtxane û nexweşxane! Yanî tu nexweş û bê îrade yî, koleyê li ber destên pisporên li van her sê derên kambax î. Çawa ku bendîxane (girtîgeh) girtiyan wek nexweşên qirêjî, nezan û xapînok dibîne, şêtxane wek dînên parçe parçe dibîne; nexweşxane jî nexweşan wek nezan û famkor dibîne; loma jî bêyî ku tenezul bike sedem û encamên nexweşî û dermanan jê re bibêje, hema wan wek robotên di nav beşên xwe yên sîmsariyê de digerîne, gelek radyasyona nepêwîst pê dide kişandin û bi derman û kontrolan timî bi xwe ve girêdayî dihêle. Yanî kes û civaka nezan lazim in jê re da ku hem xwe bidomîne hem wan bêhtir bi xwe ve girê bide, nezantir û tirsonek bike. Jixwe mirovên ku dikevin nav lepên nexweşxaneyan careke din nayên ser hemdê xwe. Lê hekîmên 'kurmancî' bi giha, axaftin û manewiyatê 'baş' dikirin, dilgerm, dost û heval bûn.

Belê, mirov û civaka bêparastin 'nexweş' e, nikare tenduristiya xwe jî biparêze, vîn û jiyana xwe jî. Lewma ne bijîşkê/a xwe, ye zana û dostê/a xwe ye. Lê ku em îsal ji vê xalê dest pê bikin û xwe 'baş' bikin dê ev çarenûs biguhere. Lewre çawa ku bindestiyê dikin qeder, nexweş û nexweşokiyê jî wisa dikin. Loma ye ku hin nexweşî tenê li welat û civakên bindest hene. Heke em îsal ji xwe re lênûskeke nû vekin û bibin zanyarên tenduristiya xwe ya bedenî û derûnî, bi wî awayî di rêyên jiyana kurdewarî ya dijwar re bimeşin; teqez em ê di sala nû de spasdar û dilxweş bin ji bo xwe û ji bo hev. Ji ber ku bedena baş, çak û çeleng; fikr û hesta baş, çak û çeleng e. Beden, fikir û hesta baş, çak û çeleng jî jiyan û civaka baş, çak û çeleng bi xwe re tîne. Rû, wekî gulên havînê bi tendurist û aramî geş vedibin; dest, wekî pêlên avê zana û herikbar dibin; dil, wekî asîmanê şefeqê tim ronîdar û bêdawî, bi tendirist e û li tu şefeqan hilnayê. Lewre her tişt wekî xelekên zincîrê pev ve girêdayî ye. Ger mirov bibêje "Ne siyasî ye, ne ji girîng e" jî girîng e bandora xwe li ser her tiştî dike. Dema mirov wiha mêze dike dibîne ku em çi qas nexweş û nezan man li hemberî serkeftina Hezîranê; lê ya girîng ev e ku em tevî nexweşiyên xwe yên kesanî û civakî bi vî awayî di ber çavan re derbas bikin.

Nêrîna Bêsînor
**Mizgîn Ronak**



## Ji bo sê jinan li Dresdenê bîranîn

Dresden ê Almanyayê, şoreşgerên kurd Sakîne Cansiz, Fîdan Dogan û Leyla Şaylemez ên di 9'ê Çileya 2013'an de li Parîsê hatin kuştin, bi bîr anîn. Bavê Leyla Şaylemez Cûmalî Şaylemez û ji TJK-E Nûpel Mûnzûr di merasîma bîranînê de axivîn. Mûnzûr da xuyakirin ku yek ji damezirînerên PKK'ê Sakîne Cansiz bi têkoşîna xwe bûye mînak ji jinên şoreşger ên ewropayî re. DRESDEN

## Xebatên jinan ranawestin

Li Çinara Amedê, Navenda Jinan a Jinwarê ya di bin banê Gerînendetiya Polîtîkayên Jinan a Şaredariyê de xebat dimeşand, hemû xebatkarên wê bi hinceta "Lîsteya xebatkarên di sala 2017'an de vîzeya wan guncan nayê dîtin" ji aliyê qeymeqamê Çinarê ve ji kar hatin derxistin û li ser vê jinan bertek nîşan da. Jinan diyar kir ku dikarin wan ji kar derxin, lê bi tu awayî nikarin xebatên wan rawestînin. Hevşaredara Şaredariya Çinarê Rûkiye Eryilmaz got ku armanca derxistina ji kar a xebatkarên Navenda Jinan a Jinwarê ew e ku jinan mehkûmî nava çar dîwaran bikin, muhtacî mêran bikin û anî ziman ku ew vê ferzkirinê bi tu awayî qebûl nakin. Halîde Turkoglu ya bi KHK'ê ji karê xwe yê li Gerînendetiya Polîtîkayên Jinan hate derxistin wiha got: "Li Çinarê, wek jinan me ji tunebûnê hebûn afirand. Bi têkoşîna li hemberî feraseta mêran a serdest em niha xwedî parkeke jinan a xwemal in. Çawa ku aqilê dewletê berê xelitî, dê niha jî wisa bibe. Li Çinarê qadên me yên alternatîf hene û li Çinarê tu jin ne bi tenê ne."

Kubra Ozturk a bi dilxwazî li Navenda Jinan a Jinwarê dimîne wiha got: "Derxistina ji kar a xebatkaran nayê qebûlkirin. Hebûna vir baweriyê dide me. Bi dilxwazî beşdarî xebatan dibim û em ê niha bêtir bixebitin. Em li benda rewşeke wisa bûn, çimkî tim bi ser jinan de tên. Dibe ku sazî hatibe girtin, lê em ê nesekinin." *AMED - DÎHABER*





## Li ser zêr wêneyê jineke reşik

Li gorî daxuyaniya saziya bi navê US Mint ku ji çapkirina pereyê hesin ê Amerîkayê berpirsyar e, li ser pereyê zêr 'Lady Liberty' ku hêjayî 100 dolarî, yekem car wêneyê jineke reşik tê bicihkirin. Ev pereyê zêr dê bi wesîleya 225'emîn salvegera amadekirina pereyê zêr ê hesin ê DYA'yê bê çapkirin. Maliyeya DYA di nîsana bihurî de bi daxuyaniyekê ragihandibû ku dê wêneyê Harriet Tubman ku yek ji sembolên têkoşîna li dijî koledariyê ye, li ser pereyê kaxiz ê 20 dolarî bê bicihkirin. WASHINGTON

## Li Swêdê kongreya jinên PYD'ê pêk hat

1'emîn Kongreya Rêxistina Jinan a PYD'ê ya Swêdê, li bajarê Vestras ê Swêdê bi dirûşma "Bi pêşengiya jina azad dê neteweya demokratîk ava bibe" pêk hat. Kongre bi deqeyeke rêzgirtinê ji bo bîranîna hemû cangoriyên Kurdistanê dest pê kir. Bi dehan jinên ku ji gelek bajarên cuda yên Swêdê hatin li ser berfirehkirina xebatên xwe yên li Ewropayê nîqaş û nirxandin kirin.

Di destpêka kongreyê Zozan Dêrik axaftinek kir. Dêrik bal kişande ser girîngiya rêxistinbûna jinan a li Ewropayê. Zozan Dêrik da zanîn ku êdî erka jina kurd zelal e, ji hêla hemû cîhanê ve tê dîtin û got: "Erk û roja jina kurd di civaka Kurdistanê de êdî zelal bûye. Ev yek li ber çavên hemû cîhanê ye. Em jinên kurd li ku dera cîhanê dibin bila bibin, lazim e em di ferqa hêza xwe de bin. Çavkanî û xwediyê hêza me ya jinan, Rêber Apo ye, em xwe di bin felsefe û ramanên rêber Apo de xwe bi rêxistin dikin. Loma jî em her tim dibêjîn û em ê her tim bibêjin; azadiya rêber Apo, azadiya me jinan e." *VESTRAS - ANF*



www.arsivakurdi.org

# 23 sal in li kujerê bavê xwe digere

**Dêrsim Onen da zanîn ku ew hêj sê mehî bûye bavê wê hatiye qetilkirin û hê jî kujerên bavê wê nehatine dîtin û wiha got: "Ev 23 sal in li kujerê bavê xwe digerim. Bavê min navê min kiribû Dêrsim, ê xwişka min jî kiribû Bêrîvan lê dewletê nehişt ev nav bibin navên me yên fermî."**






Omer Onen jî wekî sedan welatiyên kurd di sala 1990'î de li Çinarê hat binçavkirin û windakirin. Dema Onen hat windakirin keça wî Dêrsim Onen hîn 3 mehî bû û di pêçekê de bû. Onena di 23 salên temenê xwe de her li aqûbeta bavê xwe dipirse, diyar kir ku kujerên bavê wê JÎTEM, MÎT û cerdevan in. Oner destnîşan kir ku heta ku sax be dê hesab ji wan bipirse.

Onen destnîşan kir ku dema bavê wê hat windakirin ew 3 mehî bû û wiha got: "Hîn ez ji dinyayê bê hay bûm. Ez di 3 mehiya xwe de rûqalî rastiya dijmin hatim. Ji bo min êşa giran ne mezinbûna bêbav e, êşa giran nedîtina hestiyên bavê min e. Ez ne bê bav im, lê ez bê gora bavê xwe me. Min jî dixwest ku îro goreke bavê min hebe û ez biçim ser gora wî bilorînim. Lê ev jî tune ye. Bila dijminê me bizane ku bavê min tune be jî ez û neviyên wî hene. Em ê rêya vê dozê bişopînin. Ez ê rêya bavê xwe bişopînim. Tansû Çîller wê demê ev anî serê me, îro jî Erdogan tiştekî din tîne serê me. Tişta herî bieş û xemgîn nebûna kêleke bavê min e." Onen, bi lêv kir ku ji bo wê xelata bavê wê ya herî pîroz navê Dêrsim e ku li wê kiriye û wiha berdewam kir: "Bavê min navê xwişka min kir Bêrîvan û navê min jî kir Dêrsim. Lê dewleta tirk navên me di nasnameyê de nenivîsîn û nexistin fermiyetê. Ez dê îsal ji bo ku navê Dêrsim di nasnameyê de bê nivîsandin serlêdanê bikim. Daxwaz û xelata bavê xwe bînim cih. Heta ez sax bim ez ê vî navî bidim jiyandin." *AMED - DÎHABER*

## Kasibkarekî kurd jiyana xwe ji dest da

Hêzên Parastinê yên Îranê li navçeya Şilêr a li ser sinorê Rojhilat û Başûr li pêşiya kasibkaran kemînek danî û kasibkarek kurd jiyana xwe ji dest da. Di ajansên kurdî de hat ragihandin ku kasibkarê jiyana xwe ji dest daye, navê wî Azad Feyzî ye û xelkê gundê Sipore yê girêdayî navçeya Tîleko ya bi ser bajarê Saqizê ve ye.

Her wiha li gorî heman ajansan hat ragihandin ku kasibkarên kurd li ser sînor rasterast hatine gulebarankirin û ev gulebaran bûye sedem ku Azad Feyzî bi çiya de bikeve û giran birîndar bibe.
*SILÊMANÎ - ROJNEWS*

## Îstîsmar bi qeyda kamerayê derket holê

Li Qosera Mêrdînê li taxa Berçem, di qeydên kamerayê de derket holê ku zarokeke 10 salî ya ku diçe dibistanê li avahiyeke vala rastî îstîsmara zayendî hatiye.

Zaroka ku 10 salî ye, dema ji malê derdikeve ji aliyê mêrekî ve tê sekinandin û rastî îstîsmarê tê. Jina ku nexwest navê xwe bide, bûyer derxist holê û li mêrê ku zarok îstîsmar kiriye jî lêpirsîn nehatiye vekirin. Hat gotin ku rêveberiya dibistanê û mamosteyê rêber jî bi rewşê dizane.
*MÊRDÎN - DÎHABER*

## Pergala enerjiya rojê bi pêş dixin

Jinên Lîberyayê li Hindîstanê perwerdeya endezyariya enerjiya rojê ya 6 mehan a ji aliyê Barefoot College ve hatiye dayîn re derbas bûn û bi piştgiriya jinên NY'ê pergala enerjiya rojê bi pêş dixin. Lambeyên rojê gund û civakan ronî dike û ev jî saetên xebatê yên dirêj pêk tîne. Bi taybet di saetên şevê de ji bo gelek kesan ewletir e.

Li Lîberyayê saziyên elektrîkê jî tê de di dema şerê dirêj ê li welat de her tişt hat texrîbkirin. Di dema şer de kabloyên elektrîkê xesarên mezin dîtin. Niha lambe bi pîlan dixebitin.

Lîberya hewl dide ji nû ve şebekeya elektrîkê bikişîne û gelek kes bi jeneratoran elektrîka xwe peyda dikin. Zanîngeha Barefoot û jinên NY'ê bang kir ku jinên bejahiyê ji bo endezyariya enerjiya rojê bên perwerdekirin. Di 2011'an de ji 16 gundên Lîberya, Başurê Sudanê, Tanzanya û Ugandayê 26 jinan 6 mehan perwerde dît.

Bendu Sacke ya 55 salî û Anthony Sorbor ya 57 salî ku bûn endezyarên rojê, yekem car wan bi panelên enerjiya rojê elektrîk anîn mala xwe. Endezyaran di 2012'an de perwerdeya xwe temam kir û elektrîk birin 424 malan. *AMED - ŞÛJIN*



## Jinên girtî: Em serî natewînin

Bi OHAL'ê re zextên li ser girtiyên siyasî jî zêde bûn. Girtiyên jin ên girtîgeha Tîpa C ya Tarsûsê bi rêya parêzerên xwe ji Şûjinê re nameyek şand û diyar kir ku rêveberiya girtîgehê pêkanînên nû li girtiyan ferz dikin, kamera li hewadankê bi cih kirine, hejmara nameya di hefteyê de daxistine sê heban û di hevdîtinên malbatan de pirsgirêkên mezin dikêşin.

Di nameyê de wiha hat gotin: "Em di koguşên 40 kesî de 85 kes dimînin. Me bertek nîşan da û gotin dê koguşên din vebin. Lê şertên teşeyên zextên nû pêşkêş kirin. Gotin di rewşa ku derbasî koguşên nû bibin de dê li hewadankê hem kamera û hem jî mazgal bên bicihkirin. Ev tehdîd jî têr nekir vê carê dibêjin dê danûstandina têkiliyê bê qedexekirin. Hejmara nameyan jî di hefteyê de daxistin 3 heban. Li gel ku me got em van pêkanînan qebûl nakin jî dibêjin 'OHAL' û xwe didin alî. Zext çi dibin bila bibin em serî natewînin. Di her şert û mercî de em ê tê bikoşin."
*MERSÎN - DÎHABER*



## Rojnameger dest bi greva birçîbûnê dikin

Midûrê karên nivîsan ê rojnameya Demokratîk Ulusê yê berê Arafat Dayan ku ev 7 meh e li girtîgeha Sîlîfkeyê tê girtin, ev 10 roj in di hucreya yekkesî de tê girtin. Her wiha Hamza Çîçekçî ev 43 roj e di hucreya yekkesî tê girtin û çend roj berê ji aliyê rêveberiya girtîgehê ve hatibû ragihandin ku dê sewqa wî bê kirin, Hamza Çîçekçî jî hêj di hucreya yek kesî de tê girtin.

Dayan bi rêya telefonê ji malbata xwe re rewşa girtîgehê vegot û diyar kir ku hîn di hucreya yekkesî de tê ragirtin.

Bavê Dayan Îbrahîm Dayan jî destnîşan kir ku kurê wî jê re gotiye heke heta roja duşemê sewqa wan neyê kirin ew ê bi Çîçekçî re dest bi greva birçîbûnê bikin. Her wiha bav Dayan banga hestiyariyê li raya giştî kir.
*MÊRSÎN - DÎHABER*

## 'Ji her dera girtîgehê kêzik dibarin'

Girtîgeh her roj bi binpêkirina mafên mirovan dikevin rojevê. Girtîgeha Tîpa C a Jinan a Tarsûsê her dem bi binpêkirina mafên mirovan di rojevê de ye. Endamê Komîsyona Girtîgehan a Şaxa ÎHD'ê ya Mêrsînê Prz. Ozgur Çaglar diyar kir ku li Girtîgeha Tîpa C a Tarsûsê ava paqij nadin girtiyan û ji her dera girtîgehê kêzik dibarin. Çaglar anî ziman ku li girtîgehê bi Aynur Gok re hevditin kiriye û wiha got: "Gok heta niha di 4 girtîgehên cuda yên jinan de maye. Gok anî ziman ku Girtîgeha Tarsûsê ji "Kampên naziyan ne cudatir e û wiha çavdêriyên xwe parve kirin: "Avêtina firinê ji pêkanînên girtîgehê kêm maye. Li girtîgehê girtiyên di navbera 14 û 72 salî de dimînin. Mafên girtiyan ê name û telefonê ji destê wan hatine girtin. Jinên ducanî rastî pêkanîn keyfî tên. Ji mafê xwe yên tenduristiyê bê par tên hiştin. Gardiyanên mêr heta diçin qadên taybet û lêgerînan pêk tînin. Dibêjin qada cemaweriyê ye û em bixwazin herin ku em dê biçin wir."

Çaglar da zanîn ku girtî rastî îşkenceya sîstematîk tên û wiha pê de çû. "Her çend girtî hişyar dikin jî floransên salonan heta serê sibê pêxistî tên hiştin. Ev jî rêbazeke îşkenceyê ye. Li gel hemû van pêkanînan girtî li dijî vê îşkenceyê li ber xwe didin. Her dem rastî cezayên cuda tên."
*MÊRSÎN - DÎHABER*

www.arsivakurdi.org

## Ebolayê nexweşiyên cuda bi xwe re anî

**LI GÎNEYA ROJAVAYÊ** Afrîkayê kesên ku di navbera salên 2013 û 2015'an de bi nexweşiya Ebolayê ketin û ji nexweşiyê rizgar bûn, serê wan bi nexweşiyên cuda re ket belayê. Li gorî lêkolîneke ku di kovara The Lancetê de hat weşandin li Gîneyê 802 kesên ku bi nexweşiya Ebola ketin û ji nexweşiyê rizgar bûn, nexweşiyên cuda li wan peyda bûne. Li gorî lêkolîna ku hatiye kirin ji sedî 40 mirovên ku ji Ebolayê rizgar bûne, laşê wan piştî salekê ji ber dermanan sist bûye û canê wan sinciriye. Ji sedî 38 kes jî bi êşa masûlke û movikan ketine. Ji sedî 35 kesan êşa serî û ji sedî 22 kesan jî êşa navê li van der bûye. Her wiha ji sedî 8 kesên ku piştî tedawiya Ebolayê rehet bûne jî kor bûne û ji sedî 2 kes jî ker bûne. Ji ber nexweşiya Ebolayê li welatên rojavayê Afrîkayê zêdetirî 11 hezar kesan jiyana xwe ji dest da. **KONAKRÎ**



## Tirkiyeyê şand Îspanyayê girt

Li Îspanyayê 3 çeteyên DAIŞ'ê yên ku ji Tirkiyeyê çûn û xwe ji êrîşan re amade dikirin, hatin girtin. Wezareta Karên Hundir a Îspanyayê der barê girtina çeteyan de daxuyaniyek da û ragihand ku 3 çeteyên DAIŞ'ê yên ku bi eslê xwe ji Afrîkayê ne û ji Tirkiyeyê bi armanca êrîşan hatine Îspanyayê, hatine girtin. Tê gumankirin ku çete ji herêmên şer hatibin Îspanyayê. **MADRÎD**

## Bask ji bo girtiyên ETA'yê meşiya

Li paytexta herêma Baskê Bilbaoyê bi deh hezaran kes li ser banga Kolektîfa Piştgiriya Girtiyên Siyasî yên Baskê (EPPK) daketin kolanan û piştgirî da girtiyên endamên ETA'yê yên di girtîgehên Îspanyayê de. Di çalakiyê de kiryarên xerab ên li dijî girtiyên ETA'yê û şert û mercên nebaş ên girtîgehan hatin şermezarkirin. Li Îspanyayê 279 endamên ETA'yê girtî ne. **BILBAO**

## Çeteyan gundekî Afganistanê şewitand

Çeteyên DAIŞ'ê li gundekî girêdayî navçeya Kot a parêzgeha Nangarharê ya Afganistanê agir berda 65 malên gundiyan. Hat ragihandin ku gundê ji aliyê çeteyan ve hatiye şewitandin, beriya demekê ji ber metirsiya çeteyan hatiye valakirin û ji ber vê yekê dema şewatê tu kes li gunde tune bûye. Piraniya malên gund ên ku hatin şewitandin, nikarin bên bikaranîn. **NANGARHAR**

# Ebadî: Em ê li dijî PKK'ê şer nekin

**Derket holê ku Bînalî Yildirim ji bo dijberiya kurdan a ku ji Bexdayê xwestiye bi dest nexistiye û Ebadî jê re gotiye ku ew ê li dijî PKK'ê şer nekin û xaka xwe nakin qada şerê li dijî PKK'ê**

Derket holê ku serokwezîrê Tirkiyeyê Bînalî Yildirim di serdana xwe ya Bexdayê de tiştê ku xwestiye, bi dest nexistiye û dest vala vegeriyaye Enqereyê. Daxwazên serokwezîr Yildirim ên dijberiya kurdan ji aliyê Bexdayê ve nehatine qebûlkirin.

Serokwezirê Iraqê Haydar Ebadî bi Komîsyona Parastin û Ewlekariyê ya Parlamentoya Iraqê re civînek li dar xist û ji aliyê parlamenterê Tevgera Goran Hûşyar Abdullah ve hat angaştkirin ku Ebadî di vê civînê de gotiye ku ew li dijî PKK'ê şer nakin û li pêşiya êzidiyên alîgirên PKK'ê nebin asteng.

**JI PKK'Ê DITIRSIN**

Parlamenter Abdullah ê ku endamê Komîsyona Parastin û Ewlekariyê ya Parlamentoya Iraqê ye der barê gotinên Ebadî de daxuyaniyeke nivîskî weşand. Abdullah di daxuyaniya xwe de diyar kir ku Ebadî di civînê de der barê PKK û Şengalê de nirxandin kirine û gotiye ku Tirkiye û Hewlêr ji PKK'ê ditirsin.

Li gorî daxuyaniya Abdullah Ebadî di civînê de ev tişt aniye ziman: "Me ji Tirkiyeyê re ragihand ku nabe Tirkiye axa me ji bo şer bi kar bîne. Her wiha me ji Tirkiyeyê re got, em ê li dijî PKK'ê şer nekin û dijberiya li PKK'ê ne karê me ye. Wekî din me got; em ê li pêşiya iraqiyan bi taybetî êzidiyên alîgirên PKK'ê nebin asteng. Em ê dest di nêrîn û alîgiriya wan a siyasî wernedin."

**BÊDENGIYA ŞÎRÎKIYÊ**

Abdullah di daxuyaniya de bal kişand ser nêrînên Ebadî yên der barê qeyrana aborî ya di navbera Iraq û Herêma Kurdistanê de jî û nerînên Ebadî yên der barê vê mijarê de wiha anî ziman: "Haya me jê heye ku Herêma Kurdistanê ji sedî 20'ê petrola Iraqê difiroşe. Hikumeta Herêma Kurdistanê rojane ji milyonek heta milyonek û 300 hezar warîl petrolê difiroşe. Baş e çima mûçeyên karmend û pêşmergeyan nade. Ji ber ku aliyên li herêma Kurdistanê di vê mijarê de şirîkên hev in, dengê xwe li hev nakin." ***BEXDA***



# Lêpirsîna melayên sîxur

Almanyayê der barê melayên Diyanetê yên ku li welatên Ewropayê li şûna wezîfeyên xwe yên olî, ji bo MÎT'ê sîxuriyê dikir, lêpirsîn da destpêkirin. Berdevkê Wezareta Karên Hundir ê Almanyayê Johannes Dimroth der barê mijarê de daxuyaniyek da û diyar kir ku der barê melayên sîxur de lêpirsîn da destpêkirin. Berdevk Dimroth ji saziya melayên sîxur a bi navê Yekitiya Tirk û Îslamî ya Karên Diyanetê jî daxwaz kir ku di lêpirsînê de bi awayekî zelal tev bigere û alîkariya rayedarên alman bike.




Dimroth da zanîn ku ew ji bandora siyasî ya Tirkiyeyê ya li ser Almanyayê gelekî aciz in û der barê dersînorkirina melayên sîxur de jî wiha got: "Biryara dersînorkirina melayên sîxur dê hikumetên parêzgehan bidin."

Piştî hewldana darbeya leşkerî ya 15'ê tîrmehê derket holê ku melayên Diyanetê li welatên Ewropayê karê sîxuriyê dikin û agahiyan didin MÎT'ê. ***BERLÎN***

## Salvegera şoreşê bi xwepêşandanan derbas bû

Di salvegera hilweşandina rejîma Zeynel Abîdîn bîn Alî ya li Tûnisê ku wek destpêka bûyerên bi navê 'Bihara Ereban' tê zanîn û li welatên ereban rê li ber hilweşîna gelek rejîman vekir, ji ber şert û mercên nebaş xwepêşandan hatin lidarxistin. Li gel ku di ser hilweşîna desthilatdariya Zeynel Abîdîn bîn Alî re 6 sal derbas bûn jî, pirsgirêkên gelê Tûnisê çareser nebûn.

Ji ber vê yekê di serî de li bajarê Sîdî Boûzîd ku çirûska destpêkê ya şoreşê li vir pê ket û gelek bajarên welat bi armanca şermezarkirina şert û mercên aborî û siyasî yên nebaş xwepêşandan hatin lidarxistin. Ji ber xwepêşandanan di navbera xwepêşanderan û polîsan de şer û pevçûn derketin. **TÛNIS**



## Li dijî Erdogan daxwaza bertekên zelal

Li Ewropayê bertekên li dijî polîtîkayên antîdemokratîk ên Tirkiyeyê zêde dibin. Piştî Partiya Sosyalîst a Swîsreyê, Partiya Keskan a ku li bajarê La Chaux De Fondsê yê Swîsreyê kongreya xwe ya delegeyên navendî li dar xist, bertek nîşanî polîtîkayên antîdemokratîk ên Tirkiyeyê da.

Di beşa duyemîn a kongreyê de piranî behsa polîtîkayên serokkomarê tirk Recep Tayîp Erdogan û desthilatdariya AKP'ê hate kirin. Hevseroka Partiya Keskan Regula Rytz bi awayekî tund polîtîkayên Erdogan û AKP ên antîdemokratîk rexne kirin û diyar kir ku polîtîkayên Erdogan dijopîne dê neyên qebûlkirin.

Rytz di berdewama axaftina xwe de destnîşan kir ku bertekên Ewropayê yên li dijî polîtîkayên Erdogan nerm in û xwest ku li dijî Erdogan bertekên zelal bên raberkirin û piştgiriya beşên demokrat ên li Tirkiyeyê bi taybetî jî bi HDP'ê re bê xurtkirin. **STOCKHOLM**

# Filîstînê li Vatîkanê balyozxane vekir

Filîstînê piştî ku ji aliyê Vatîkanê ve bi awayekî fermî hat nasîn, li Vatîkanê balyozxane vekir. Serokê Filîstînê Mehmûd Ebbas beriya vekirina balyozxaneyê çû serdana serokê Vatîkanê Papa Franciscus. Piştî serdanê Balyozxaneya Filîstînê bi tevlîbûna Mehmûd Ebbas û Papa Franciscus bi merasîmekê hat vekirin.

Di merasîma vekirina balyozxaneyê de serokê Filîstînê Ebbas axaftineke kurt kir û ev peyam dan:"Ev rewş nîşaneya hezkirina Papa ya li hemberî gelê Filîstîn û aştiyê ye. Em hêvî dikin ku welatên din jî Vatîkanê ji xwe re mînak bigirin û Filîstînê nas bikin."

Vatîkanê di 2016'an de bi peymanekê Filîstîn nas kir. Di vê peymanê de ji ber ku qala xebat û asta Dêra Katolîk ya li Filîstînê hatibû kirin, Îsraîlê bertekên tund nîşanî Vatîkanê dabûn. ***VATÎKAN***



# Bi dehan penaber noqî avê bûn

Li peravên Derya Spî yên Lîbyayê keştiyeke penaberan ku herî kêm 107 penaber tê de bûn, noqî binê avê bû. Tenê 4 penaber ji keştiyê sax hatin rizgarkirin û hemû penaberên din ê di keştiyê de xeniqîn û jiyana xwe ji dest da.

Penaberên ku hatine rizgarkirin da zanîn ku keştiya wan ji ber şert û mercên nebaş ên hewayê noqî avê bûye.

Hat ragihandin ku cenazeyê 8 penaberan hatiye dîtin û lêgerîna cenazayên din berdewam dike. Li aliyê din di navbera Îtalya û Lîbyayê de roja pêncşemê bi qasî 800 û roja înê jî bi qasî 550 penaber bi saxî hatibûn rizgarkirin. Her wiha li rojhilatê Hindistanê jî keştiyeke ku li pîrozkirina cejnekê vedigeriya, noqî çemê Ganjê bû û di encamê de herî kêm 26 kes mirin. ***ANF***



www.arsivakurdi.org

## Ji bo şehîdan merasîmek li dar xistin

Bi armanca bîranîna şehîd Xebat Dêrik, şehîdên komkujiya Parîsê û Silopiyê, bi pêşengiya TEV-DEM'ê li taxa Zorava ya Şamê merasîm hat lidarxistin. Di axaftinên merasîmê de şehîdên Kurdistanê hatin bibîranîn û soza şopandina rêya wan hat dayîn. Di axaftinan de bal kişandin ser qetilkirina Sakîne Cansiz, Fîdan Dogan û Leyla Şaylemez û bang li saziyên mafên mirovan hat kirin ku kujerên wan bên darizandin. Komkujiya Silopiyê jî hat şermezarkirin. **ŞAM**



## Dewreya şehîd Birûsk dest pê kir

Dewreya perwerdeyê ya Şehîd Birûsk a Akademiya Şehîd Berxwedan a Şengalê bi beşdariya 37 şervanan, bi merasîmekê dest pê kir. Di merasîmê de ji fermandarên YBŞ'ê Mazlûm Şengal got ku dê sala 2017'an bibe sala azadiya Êzidxanê û gelê êzidî. Piştî merasîma leşkerî şervanan bi tevlîbûna Koma Çand û Hunerê ya Êzidxanê şahiyek li dar xist. Merasîm bi dirûşmên 'Bijî serok Apo', 'Şehîd namirin' û 'Holhola Tawûsê Melek e' bi dawî bû. **ŞENGAL**



# 'Civîna Astanayê dê têk biçe'

**Endama Desteya Navendî ya PYD'ê Emîne Osê da zanîn ku ger nûnerên gelên Sûriyeyê tev li civîna Astanayê nebin dê mîna civînên Cenevreyê bê encam bimîne. Osê got ku çareserî bi beşdarbûna nûnerên gel pêkan e**

FÎDAN ABDULLAH / EFRÎN - ANHA



Endama Desteya Navendî ya PYD'ê Emîne Osê destnîşan kir ku ji ber nebeşdarbûna hemû aliyên Sûriyeyê di civîna Astanayê de, dê tu encam ji civînê jî dernekevin.

Emîne Osê diyar kir ku civîna Astanayê yek ji encamên lihevkirina Rûsya û Tirkiyeyê pêk tê û ev nirxandin kir: "Ji aliyekî din ve jî Rûsya dixwaze piştî şerê Helebê ji plana radestkirina Babê ji Tirkiyeyê, li Rojhilata Navîn xwedî helwestekê be. Israrkirina Rûsya, Tirkiye û Îranê li ser çareseriyên leşkerî ne gaveke cidî ye. Ji bo aloziya Sûriyeyê pêwîstî bi çareseriyeke bingehîn heye."

### DÊ TÊK BIÇE

Di berdewamê de Emîne Osê got ku ji ber dijberiya Tirkiyeyê ya di beşdarbûna nûnerên kurd li Astanayê de, komên çete yên koalisyonê jî ji civînê hatine dûrxistin û wiha pê de çû: "Çarenûsa civîna Astanayê dê wekî Cenevreyê be. Ji ber ku nûnerên gelên Sûriyeyê beşdar nabin."

### NÛNERÊN GEL

Emîne Osê di dawiya axaftina xwe de jî ev nirxandin kir: "Ger ev hêz bi awayekî cidî bixwazin aloziya Sûriyeyê çareser bikin, divê bihêlin ku hemû aliyên Sûriyeyê û nûnerên hemû pêkhateyan beşdarî civînan bibin. Divê teqez nûnerên federaliya demokratîk jî amade bin. Ji bo çareserkirina aloziya Sûriyeyê em amade ne bi hemû hêzan re danûstandinan bikin."

## Êrîşa çeteyan hat şikandin

Komên çete yên DAIŞ'ê di sibeha 15'ê çileyê de êrîşî gundê Odyanê kir. Li ser vê yekê şervanan bersiva çeteyan da û êrîşa çeteyan hat şikandin. Şervanan li herêmê dest bi operasyona paqijkirinê kir.

Qonaxa duyemîn a Xezeba Firatê ya ku bi armanca rizgarkirina gundewarên rojavayê Reqqayê hatiye destpêkirin, berdewam dike. Di çarçoveya hemleyê de şervanên Xezeba Firatê gundê Odyan ê ku dikeve rojhilatê bakurê Mehmûdiyê ji çeteyan rizgar kir. Hat zanîn ku komên çete ji bo paşve dagirtina gund, bi hêzeke mezin êrîşeke dijwar pêk anî.

Li gorî agahiyan, li ser bersivdayîna şervanên Xezeba Firatê li gund pevçûnên dijwar qewimîn. Di encama pevçûnan de êrîşa komên çeteyan bi tevahî hat şikandin. Piştî şikandina êrîşê jî şervanên odeya çalakiyan li gund dest bi hemleya paqijkirina herêmê kir. Der barê encamên şer û pevçûnan de heta niha tu agahiyên zelal nehatin bidestxistin.
*REQQA - ANHA*



## Tirkiyeyê herî kêm 130 sivîl qetil kirin

Çalakvanên herêmî da zanîn ku artêşa tirk di du mehên dawîn de zêdetirî 130 welatiyên sivîl qetil kirine.

Çalakvanên herêmî da zanîn ku artêşa tirk di navbera 21'ê mijdara 2016'an heta 13'ê çileya 2017'an 130 sivîl kuştine û 37 jî birîndar kirine. Di raporê de ev dane hatin parvekirin: "Di êrîşa Tirkiyeyê ya di 13'ê çileyê de 17 sivîl hatin kuştin û 20 jî birîndar bûn. Di 11'ê çileyê de jî, welatiyê bi navê Ebdulhekîm Hemûd li Um Edesê di îşkenceyê de kuştin û 6 hezar dolarên wî dizîn."

Çalakvanan da zanîn ku di encama topbarana li dijî gundê Bezaayê ya di 11'ê çileyê de jî Ebdulsetar Yasîn û keç û kurekî wî û Cewad Yasîn hatin qetilkirin û wiha domand: "Çeteyên Tirkiyeyê di 11'ê çileyê de Mihemed El Mistefa El Hemade bi îşkenceyê qetil kir. Ji bilî van, 91 sivîlên din jî hatin kuştin û 45 jî birîndar bûn."

### NAVÊN QURBANIYAN

Di berdewamê de çalakvanan da zanîn ku di êrîşên 22'ê kanûnê de jî ev welatî hatin qetilkirin: "Ji malbata Esfûr 13 kes, ji wan Ehmed Hisên El Esfûr û hevsera wî ji mala Xelef tevî 4 zarokan hatin qetilkirin. Ji malbata Nimet 6 kes ji wan Cifer kurê Omer Taha Nimet û hevjîna wî ji mala Eqîl tevî çar zarokan. Ji malbata El Abû 13 kes ku ji wan Nacî Şerîf El Abû û hevserên wî Emîne El Ikêl û Nisrîn Ninaî û zarokên wan Ebdulrehman, Îsam, Wail, Berai. Her wiha Mihemed tevî jina xwe Rena Kino û zarokên wan Omer, Emane, Hemze û Mecid. 2 kes ji malbata Sebax. Jinek ji malabat Edî, Zarokeke ji malbata Qirudî, 27 kes ji malbata Şelaş, 5 kes ji malbata Ezîz Şelaş, nasnameyên ji malbata Kizkaz nehat zelalkirin, 10 kes ji malbata Naqo, 6 kes ji malbata Xezal, Ibrahîm Qeblawî, hevjîna Mistefa Mehmûd El Siker, Mistefa Mihemed Xelîfe, Cefer Birêtawî û hevsera wî Muna Ebû Emrû û zarokên wan Mihemed û Fatma, Mehmûd El Nime û hevsera wî û 3 zarokên wan."*QAMIŞLO - ANHA*



## Salvegera Kongreya Star pîroz kirin

Rêxistina Kongreya Star a Amûdê bi boneya 12'emîn salvegera avakirina Kongreyê Star, li salona Meclisa Eyaleta Amûdê civînek li dar xist. Di civînê de endama Rêveberiya Kongreya Star Mira Zoro salvegera avakirina Kongreya Star li hemû jinên bakurê Sûriyeyê û Ocalan pîroz kir. Mira da zanîn ku bi raman û felsefeya Ocalan jinan mafên xwe bi dest xistin û li hemberî zordariyê serî hilda. Di dawiya civînê de jî bi daxuyaniyekê tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan hat şermezarkirin. **AMÛDÊ**



## 1'emîn Konferansa Kongreya Star pêk hat

Yekemîn konferansa Kongreya Star bi beşdariya 210 endamên ji hemû pêkhateyên civakê, nûnerên meclisên taxên rojhilatê bajêr, YPJ'ê, endamên Koordînasyona Kongreya Star a Kantona Efrînê, Endama Rêveberiya Koordînasyona Kongreyê Zelal Ceger û Şêwirmenda Rêveberiya Xweser a Kantona Efrînê Fehîme Silêman li taxa Şêxmeqsûd a Helebê dest pê kir. Konferansê bi rêzgirtinê dest pê kir û piştre jî dîwana ku ji 3 kesan pêk dihat, hat hilbijartin. 1'emîn Konferansa Kongreya Star bi axaftinan berdewam kir. **HELEB**



## Zewaca bi darê zorê rawestandin

Mala Jinan a Minbicê di çarçoveya çareserkirina pirsgirêkên malbatan û pirsgirêkên jinan de ên ku di nav civaka Minbicê de derdikevin, bi dehan doz û pirsgirêkên ku li pêşiya jinan derketine, çareser dike. Mala Jinan doza jina ciwan a bi navê Z.A (21) ku malbata wê dixwest wê bi darê zorê bizewicîne, çareser kir. Têkildarî mijarê endama Komîteya Lihevanînê ya Mala Jinan Îman Hemşo diyar kir ku piştî ku wan bûyer bihîst, li gel malbatê nîqaş kirine û pirsgirêk çareser kirine. **MINBIC**

## 2'yemîn konferansa HPC-Ciwan pêk hat

Bi beşdariya 200 endamên Hêzên Parastina Civakî (HPC-Ciwan) a navçe û navenda Efrînê, 2'yemîn Konferansa HPC - Ciwan hat lidarxistin. Di konferansê de nûnerên HPC, YPG û Ciwanên Yekitiya Êzidiyan amade bûn. Di konferansê de li ser navê Yekitiya Ciwanên Rojava (YCR) Harûn Diyar xêrhatina beşdarvanan kir û konferansa duyemîn li HPC-Ciwan, YPG/YPJ'ê û hemû beşdaran pîroz kir. Konferans bi axaftinên beşdaran berdewam kir. **EFRÎN**

## Gelê Minbicê li dijî Tirkiyeyê bi hêrs e



Welatiyên Minbicê êrîşên dewleta tirk a dagirker û kiryarên wê yên li herêmê şermezar kirin û destnîşan kir ku kiryarên artêşa tirk ji yên çeteyên DAIŞ'ê ne kêmtir in.

Der barê mijarê de welatiyê bi navê Mihemed Termûş ê ji pêkhateya tirkmen diyar kir ku ew bi tu awayî dagirkeriya Tirkiyeyê qebûl nakin û destnîşan kir ku ew ê bi hêza xwe welatê xwe ava bikin. Jina bi navê Fadiya Mehmûd a ji pêkhateya ereb jî got ku ew ê li gel şervanên meclisa leşkerî li dijî dagirkeran bi tê bikoşin. Fadiya Mehmûd bi lêv kir ku Tirkiye bi çeteyên DAIŞ'ê re di nava hevkariyê de ye.

Welatiyê bi navê Ramî Beloz û ji pêkhateya çerkez û Mistefa Kalo yê ji pêkhateya kurd jî daxuyand ku gelê bakurê Sûriyeyê dikare xwe bi xwe, xwe bi rê ve bibin û dawî li dagirkeriya Tirkiyeyê bînin. Welatiyan bang li qada navneteweyî kir ku demildest mudaxaleyî êrîşên Tirkiyeyê bikin. **MINBIC - ANHA**

## Tirkiye êrîş dike koçberî zêde dibe



Koçberiya gelê herêma Şehbayê ya ji ber êrîş û dagirkeriya Tirkiyeyê ya ber bi kantona Efrînê ve berdewam e.

Li gorî agahiyên ji herêmê, artêşa tirk û çeteyên wê di 14'ê çileyê de gundên Qol El Sirûc û Tili Midyeq ên Şahbayê topbaran kirin. Hat zanîn ku balafirên Tirkiyeyê jî di şeva 14'ê çileyê de gundê Til Rehal ê Babê bombebaran kir û di encamê de ziyanên madî pêk hatine.

Endamên Buroya Kar û Barên Koçberan da zanîn ku di encama êrîşên Tirkiyeyê de di nava 2 rojan de hezar û 351 welatiyên ji herêmê koçî Kantona Efrînê kiriye. Endaman banga alîkariyê li rêxistinên navneteweyî kirin. **EFRÎN - ANHA**

www.arsivakurdi.org

ROJEVA Medya
16 Çile 2017 Duşem

## Polîsan rojname desteser kirin

Polîsan duh bi maşîneyên zirxî li taxa Barbarosê ya navçeya Seyhana Edeneyê belavkarê rojnameya me Rojeva Medya û rojnameya Ozgurlukçu Demokrasiyê rawestand û bêyî ku hincet nîşan bidin hemû rojname desteser kirin. Polîsan hemû rojname ji nav tûrikê li ser motosîkletê derxistin û desteser kirin. Her wiha polîsan xwest motosîkletê jî têxin maşîneyên xwe lê ji ber ku moto-sîklet neket maşîneyê dev jê berda.

Her wiha piştî îlankirina OHAL'ê bi dehan televîzyon, radyo, rojname, weşanên muxalîf û saziyên çapemeniyê hatibûn girtin. EDENE - DÎHABER






## Em ê kampanyaya 'NA' bimeşînin

Parlamentera HDP'ê ya Stenbolê Fîlîz Kerestecîoglu bertek nîşanî pêşnûmeya guherîna Destûra Bingehîn da û destnîşan kir ku Tirkiye her ku diçe ber bi rejîmek otorîter, serdestiya mêr û feraseta mîlîtarîst ve diçe û wiha got: "Şîdeta li ser jinan, dema yek mêrek bibe serok wê zêdetir bibe. Ev pergal dê mekanîznameyên kontrolê jî ji holê rake. Pergalek ku piraniyê tune dihesibîne li dijî jin û xwezayê ye jî."

Kerestecîoglu di berdewamê de diyar kir ku 11 parlementerên wan tenê ji ber fikrên xwe îfade kirine hatine girtin û got ku wan mafê xwe yê faliyetên qanûnî û dengdanê ya parlamentoyê bikar neanîne û wiha domand: "Piştî me biryara xwe aşkera kir şûn de dor hat dengdanê û nav hatin xwendin 'Selahattîn Demîrtaş, Fîgen Yuksekdag, Besîme Konca...' û me jî digot 'di girtîgehê de ne'. Ev şermeke mezin a parlamentoyê ye. Niha ber bi feraseteke mîlîtalîst û otorîter ve diçe."

Kerestecîoglu destnîşan kir ku ji ber HDP'ê nebe muxalefeta vê pêşnûmeyê hewl didin asteng bikin û da zanîn ku dê nebin hevkarên vê lîstikê û wiha pê de çû: "Divê her kes xwedî li daxwaza xwe ya azadîxwaz û jiyana xwe derkeve. Divê gelê me, sendîka û rêxistinên civaka sivîl heta dawiyê tê bikoşin. Ger referandûm hebe em ê kampanyaya 'na' bimeşînin."

STENBOL - ŞÛJIN

# Kesên ku rejîma nû meraq dikin bila li Şirnexê binêrin

**Parlamentera HDP'ê ya Şirnexê Aycan Îrmez têkildarî nîqaşên xalên makeqanûnê ên li meclisê tên kirin, diyar kir ku heke ev daxwaz bê erêkirin dê pêşeroja hemû kesên li derveyî AKP'ê wekî ya Şirnexê be**



Parlamentera HDP'ê ya Şirnexê Aycan Îrmez bertekê tund nîşanî nîqaşên li ser guhertina xalên Qanûna Bingehîn da û diyar kir ku ger ev pêşniyar û daxwazên guhertina qanûnan bên erêkirin û bibin qanûn dê her kes wekî Şirnexiyan bê dîtin û ji bilî endam û rêveberen AKP'ê dibe ku malên her kesî bên xerakirin. Îrmez di civîna meclisê de helwesta parlamenterên ku guhertina xalên qanûnê erê dikin rexne kir û wiha got: "Li vî welatî hevserokên partiya 3'yemîn ku 6 milyon deng girtine îro di girtîgehê de ne. Partiya ku herî zêde şaredarî li herêmê qezenç kirine bi sedan hevşaredar û siyasetmedarên wê girtî ne. Ev kesên niha girtî li gorî qanûna ceza ne sûcdar in. Tenê sûcê wan ewe ku di hilbijartina 7'ê Hezîrana 2015'an de destûr nedaye ku AKP bi serê xwe bibe îxtîdar."

Îrmez bal kişand ser rewşa Colemêrgê ku niha hemû hilbêjerên wê girtine û wiha domand: "Niha vîna Colemêrgê di guhertina van zagonan de xuya nabe. Ev rewş tenê ji bo gelê Colemêrgê derbas nabe. Ev di heman demê de ji bo Şirnexê jî derbas re. Bajarê Şirnexê bi mehan di bin dorpêçê de ma. Xwestin ji nexşeyê paqij bikin. Gelo di dîroka cîhanê de mînakê vê yekê hene? Ji bo gelê Şirnexê jî ev guhertina bi zora AKP'ê pêk tê ne rewa ye. Li bajarekî xera bûbe û talan bûye qanûn nayê çêkirin."

Îrmez da zanîn ku herî zêde gelê Şirnexê ku bi mehan hatine dorpêçkirin û rastî hemû êrîşan hatin dikarin wate bidin van guhertinan û wiha pêde çû: "Her çend nûnerên AKP'ê ji bo van guhertinan bêjin rejîm nayê guhertin jî dema em li polîtîkayên AKP'ê yên li ser Şirnexê binerin em bi rehetî dibînin ku Komar ji holê radibe. Li şûna Komarê rejîmek din tê avakirin. Ev rejîm li dijî hiqûq, sinc û nirxên mirovahiyê ye. Navê vê rejîmê mirin û zilm e. Ev rejîm naşibe tu rejîman. Kesên ku meraq dikin ka piştî qebulkirina van qanûnan dê jiyana wan de çi bê guhertin bila vekin di înternetê de rewşa Şirnexê binêrin. Ji ber ku ev rejîm kesên ku ne ji wî ne wekî şirnexiyan bihesibîne û mala wan bi ser wan hilweşîne."

*ENQERE - DÎHABER*



# Ji Bloka Aştiyê biryara 'têkoşîneke nû'

Bloka Aştiyê ya çend roj berê li dijî Rewşa Awarte (OHAL) û "Serokomartiya Partiyî" ya tê xwestin bê avakirin biryara rêxistinbûyîneke nû da û armanca blokê ew e ku her meh bi navê "Bloka Aştiyê" bulteneke biweşîne û bi vê bultenê bîbiriyekê biafirînin. Di der barê xebata ku dê bê kirin de Hevberdevkê Blokê Bahadîn Altan axivî.

Altan anî ziman ku ew ê koordînasyoneke li gorî civakê tevbigere ava bikin û wiha behsa xebatên xwe kir: "Em ê ji vê mehê û pê ve, bulteneke Bloka Aştiyê biweşînin. Me vê mehê, têkildarî şer û aştiyê geşedanên ku meha berê di xwe de dihebîne, bultenek weşand. Em di sibatê de jî li gorî geşedanên meha çileyê bultenekê biweşînin. Em ê her meh van bultenan biweşînin. Divê em di vî warî de ji bo civakê bîrbiriyê bidin der. Em bi hemû saziyên ku aştiyê diparêzin û çareseriyên demokratîk pêşniyar dikin bi hev re tevdigerin."

Altan der barê guherandinên Qanûna Bingehîn a li Meclisê nîqaşên wê tê kirin ev tişt anî ziman: "Dixwazin van qanûna bi lez û bez derbas bikin. Rejîma nû; bêyî di nav civakê de baş bê nîqaşkirin, ji civakê vedişêrin û naxwazin bi rêya weşanan bigihêje gel. Ji bo axa bibe welat ne hewceye di oxira wê de ciwan bimirin, em ê vê ji civakê re vebêjin. Ne tenê ji bo Tirkiyeyê, dê bultena aştiyê bi zimanên biyanî jî bê wergerandin û dê ji saziyên navnetewî yên li dijî şer in bê şandin. Divê em; kurd, ereb, êzidî, ewropayî, amerîkî û hwd. bi hev re li dijî şer bitêkoşin. Têkoşîneke gerdûnî." *STENBOL - DÎHABER*



*Bloka Aştiyê ya li dijî OHAL û serokomariya partiyî biryara birêxistinbûneke nû da*



## 'Doza me dê bibe navê têkoşîna edaletê'

Hevseroka HDP'ê Fîgen Yuksekdag ji Konferansa Navneteweyî ya Hiqûqê ya bi mijara "Di Dema OHAL'ê de li Tirkiyeyê Pergala Darazê" ku li Enqereyê hat li darxistin ji girtîgehê peyam şand. Yuksekdag di peyama xwe de diyar kir k udi qada têkoşîna hiqûq û edaletê de ji bo ku ew bi xwe bawer bin gelek sedemên wan hene û wiha got: "Mixabin ji ber bêhiqûqiya giran a li Tirkiyeyê derfetên me yên ku em bi awayekî fiîlî li cem we bin tune ne. Lê rewş ji bo ku em bi dil, mêjî û ramanên xwe li cem we bin ne asteng e. Em dîwarên girtîgehê li dijî têkoşîna xwe ya ji bo hiqûqê wekî astengî nabînin." Yuksekdag di peyama xwe de bal kişand ser krîza siyasî û civakî kul i Tirkiyeyê tê jiyîn û ev tişt anî ziman: "Em niha di encama krîza siyasî û hiqûqî de girtine lê hûn jî parêzerên me ne. Di demeke nêz de her yek ji me dê wekî kesên ku ji bo hiqûqeke nû têkoşînê didin û ji bo edaletê li ber xwe didin bên bibîranîn." ENQERE



## Polîsan gefa mirinê li Okatan xwar

Parêzerê ji Bûroya Hiqûqê ya Çewisandiyan Sezîn Uçar têkildarî Midûra Berpirs a ETHA'yê ku ev 22 rojan di bin çav de ye axivî û wiha got: "Bi qasî 100 kes di heman cihî de tên girtin. Di saetên sibê de muwekîla min Okatan xwestiya deriyê tuwaletê din jî ji hêla polîsan ve bê vekirin lê amîrê polîsan bersiva 'kawişa we ceza girtiye, herî dawî hûnê derkevin' daye wan. Okatan jî bersiva 'cezayekî gelekî giran e bi rastî' dide û vê carê polîs gefa 'ez ê te bixeniqînim û bikujim' dixwe. Her wiha dîsa bi gotinên wekî 'ez ê guh nedim gotinên terorîstekê' heqeret li wan kiriye." STENBOL

## Qeyûm navenda jinan û çandê kir hedef

Di 5'ê mijdara 2016'an de Wezareta Karên Hundir li şûna hevşaredarê Şirnexê Serhat Kadirhan alîgirê Waliyê Şirnexê Turan Bedîrhanoglu wek qeyûm tayîn kir. Şaredariya Bajarê Mezin a Antalyayê Menderes Turel jî wek şewirmendiya qeyûm tayîn kir. Qeyûmê şaredariya Şirnexê û yê şewirmedê wî ewil dest bi avêtina karkeran û pêşîlêgirtina xebatên jinan kir. Qeyûm sereke Midûriyeta Jinan a şaredariyê girt û xebatkarê midûriyetê sosyolog Ayfer Şahîn ji kar derxist. Qeyûmê ku Navenda Şewirmendiya Jinan a Zahîde jî girt hemû xebatkarên jin lijneyên din bi cih kir. Navenda Çanda Cudî ku kar û xebatên çandê dimeşand jî hat girtin û xebatkarên çandê jî derbasê lijneyên wekî Karên Avê û Zabitayê kirin.



Bajarê ku 7 taxên wî dema qedexeya derketina 246 rojan de hatin wêrankirin, hemû xebatkarên Midûriyeta Plansaziyê jî ji kar hatin derxistin. Piştî ku qeyûm hat avêtin yek xebatkarê jin ya Miduriyeta Plansaziyê bi qeyûmê re nexebitî û îstîfaya xwe da.

ŞIRNEX - DÎHABER

ROJEVA Medya
16 Çile 2017 Duşem

# Çîroka 12 SIWARAN vegot



DÎCLE ÊTO / BEHDÎNAN / ANF

Gerîlaya jin a bi navê kod Viyan Mazlûm, di sala 1992'yan de li bajarê Kobanê yê ku bi berxwedana xwe tê naskirin, ji dayik dibe. Bi mebesta 'hebûna dijmin li Kurdistanê heqareteke mezin e', lêgerînên Viyan yên azadiyê her ku diçe mezin dibin.

Viyan di sala 2010'an de tev li nava refên gerîla dibe û sala 2014'an di nava dozdeh Siwarên Derwêşê Evdî de cih digire. Gerîla Viyan çîroka xwe ya 12 Siwaran wiha vedibêje: "PDK daxwaza me ya alikariyê ya bi mebesta ku em bi hev re mil bi mil şer bikin, red kir û her wiha dema ku hevalên me xwest ku derbas bibin, astengî derxistin. Ev jî bû faktoreke mezin ku cara 74'an civaka me ya êzidî were qirkirin û Şengal bibe navenda êş û azarên ku neyên jibîrkirin."

Piştî ku Mûsil bi giştî kete bin kontrola çeteyên DAIŞ'ê, piştî hin lihevkirinan û hesabên takekesî hatin kirin, PKK'ê pêşbiniya wê kir û got dibe ku êrîşeke giran bi ser Şegalê de bînin, ji bo vê jî 12 gerîla şandin Şengalê.

Viyan da zanîn ku wan xwe ji çiyayên azad berdaye xwarê û bi awayekî veşartî derbasî Şengalê bûn. Ji ber astengiyên heyî 4 rojan li ser sînor man, lewre ew bi derengî ketine Şengalê û wiha got: "Me di destpêkê de xwest li dijî gefên li ser Şengalê, gel amade bikin. Ji ber ku di destpêkê de me civaka êzidî baş nas nedikir, li gorî dilê xwe me nekarî bixebitin. Em wek 12 Siwarên Derwêşê Evdî, me koma xwe di nav xwe de dabeş kir. Ji bo ku em bikarin gel amade bikin û dest bi xebatên perwerdehiya ciwanan bikin, em bûne 3 kom û her komek jî ji 4 hevalan pêk dihat. Bi vî awayî me gund di nav xwe de parve kirin û dest bi xebatên perwerdehiyê kir."

Viyan diyar kir ku li gel ku civaka êzidî civakeke qedîm e û li ser hîmekî dîrokî ediliye jî, di jiyanê de, ji hêla stratejîk ve nedikarî xwe bi rê ve bibira.

**3 GERÎLA GIRTIN**

Viyan anî ziman ku beriya qirkirinê PDK'ê 3 gerîla girtin û li gel hewldanên gelê êzidî hevalên wan serbest nehatin berdan. Viyan bi berdewamî ragihand ku 3'yê Tebaxê ango di fermana 73'yan de, 9 Siwarên Derwêş amade bûn û piştî demekê agahî ji wan re hatiye ku 3 hevalên wan jî

*Gerîla Viyan Mazlûm yek ji wan 12 Siwarên Derwêşê Evdî ye ku rê neda ku komkujiyeke mezintir li Şengalê çêbe. Viyan Mazlûm behsa fermanê û berxwedana 12 siwaran kir*

serbest hatine berdan.

Viyan da xuyakirin ku dema ku Til Efer û Mûsil ket bin kontrola çeteyên DAIŞ'ê, DAIŞ'ê bi hêzeke mezin xwe ji bo dagirkirina Şengalê amade kiribû; "Êrîşê saet di 08:00'an de dest pê kir. Li gundê Til Benat gel berxwedaneke mezin pêk anî. Di heman demê de 4 hevalên me yên ku li Til Benat bi cih bûbûn xwest ku êrîşan bişikînin. Saet di 14:00'an şer giha gundê Xanê Sor û Sînonê. Wê demê, hin ciwanên êzidî yên ku me ew perwerde kiribûn bi me re li dijî çeteyan şer dikir. Di navbeyna 2 saetan de şerekî giran çêbû. Li gel ku çeteyan em dorpêç kiribûn jî û xwest em radest bibin jî, ev pêk nehat û bi berxwedaneke mezin ev êrîşa çeteyan hate şikandin."

Mazlûm da xuyakirin piştî ku wan li dijî çeteyan li ber xwe da û şerekî giran çêbû, ew fersend ji gel re çêbû ku xwe bispêrin çiyê û piştî ku gerîlayên HPG'ê, YJA Starê derbasî Şengalê bûne morala wan hatiye cih û wiha got: "Di rewşeke wiha de ku em wek HPG bi tena serê xwe mabûn, vebûna Korîdora Mirovahiyê ya ji hêla şervanên YPG-YPJ'ê ve, bi mebesta ku gelê êzidî derbasî Rojava bibe û xilas bibe ji destê çeteyên DAIŞ'ê, ji me re bû moraleke pir baş. ''

Viyan got, bi berxwedana gerîlayên HPG, YJA Starê û her wiha bi berxwedana ciwanên êzidî û şervanên YPG-YPJ'ê, bi şehadet û bi berdêlên giran Şengal 13'ê Mijdara 2015'an ji çeteyên DAIŞ'ê hate azadkirin. Ji bo vê jî 13'ê Mijdarê pêkanîna serkeftin û azadiyê ye.



## Tola jinan hildan

**VIYAN DIYAR KIR** ku bi hezaran êzidî hatin kuştin û bi hezaran jin dîl hatin girtin, hê jî çarenûsa bi hezaran jinan ne diyar e. Viyan axaftina xwe wiha domand: "Kîjan aqil dikare vê qebûl bike, kîjan wijdan dikare bi van kirinan rehet bibe. Tenê aqil û wijdanê tunebûyî yê çeteyên DAIŞ'ê dikare vî tiştî qebûl bike û destekê bide rewşeke wiha ya trajîk. Ji ber ku ew xwedî dinyayeke din in." Viyan da xuyakirin ku ji bo ku jinên dîlgirtî werin azadkirin û jinan ji bindestiyê rizgar bikin û tola jinên êzidî hilînin, çi ji destê wan were, dê bikin.

# Armanca PDK`ê çi ye?

EKREM BEREKAT

Hin rastî hene ku pêwîst e bi taybet şêniyên Rojava û yên Kurdistanê bi tevahî bizanin. Kî nahêle gelê kurd bibe yek û astengiyan li pêşberî lidarxistina Kongreya Neteweyî ya Kurd saz dike, tevî ku Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan gelek caran bang li vê yekê kir?

Di dawiya sala 2016`an de, Koma Civakên Kurdistanê KCK`ê bang ji bo pêkanîna kongreya neteweyî kir ku tê de hemû pirsgirêkên gelê kurd û yên Kurdistanê, bi taybet jî yên li Rojava, Şengal, başûrê Kurdistanê û êrîşênTirkiyeyê li ser bakurê Kurdistanê bên çareserkirin.

Ev bangewaziya KCK`ê ji aliyê gelê kurd ve li her çar parçeyên Kurdistanê bi kêfxweşî hat pêşwazîkirin. Lê PDK`ê careke din li hemberî vê yekê bû kelem û dest bi hemleya ragihandina li dijî PKK`ê kir.

Gotinên nûnerên partiyê û rêveberên herêmê bê navber dom kirin. Li rex wê jî PDK`ê di bin hincetên bêbingeh de ji gerîlayên HPG'ê xwest ku xwe ji Şengalê vekişînin. Di demeke wisa de ku hîna gel azarên vekişîna PDK`ê ji Şengalê û radestkirina wan ji çeteyên DAIŞ`ê re ji bîr nekiriye.

Her wiha serokwezîrê Başûr Nêçîrvan Barzanî di semînereke li başûrê Kurdistanê ku hin kesayetên kurdistanî tê de amade bûn, bi awayekî aşkera êrîşî PKK`ê û PYD`ê kir û ew bi terorê tewanbar kir. Ev yek rojek piştî banga KCK`ê ya yekitiyê pêk hat.

Êrîşên hikumeta PDK`ê di vê çarçoveyê de neman, lê gihîşt asta ku serokwezîrê tirk pêşwazî bike, di demeke wisa de ku Tirkiye rojane li bakurê Kurdistanê gel wêran dike û her wiha li rex Mesud Barzanî, Bînalî Yildirim daxuyanî bide ku PKK`ê, YPG`ê PYD`ê bi 'terorîzmê' tewanbar bike!

Êrîşên rayedarên PDK`ê yên li hemberî rojavayê Kurdistanê tu caran nesekinîne lê her hewl dide bi rêya dezgehên xwe yên ragihandinê TEV-DEM`ê û PYD`ê bi hevkariya bi rêjîmê re tewanbar bike. Lê rastî tam berovajî vê yekê ye.

Hin çavkaniyên pêbawer da zanîn ku rêjîma Baas bi awayekî veşartî destek daye PDK`ê û ev yek jî li Hewlêrê pêk hatiye. Bi vê yekê jî xwestiye ku li hemberî PYD`ê û TEV-DEM`ê bisekine û di Koalîsyona Niştimanî ya Sûriyeyê de bibe cihê baweriyê. Li gorî heman çavkaniyan derbasbûna ENKS`ê di nava refên koalîsyonê de bi fermana rejîma Baasê pêk hatiye da ku ENKS agahiyên leşkerî û siyasî ji nava koalîsyonê ji rejîmê re bişîne. Balkêş e ku bi tevlîbûna ENKS'ê di nava koalîsyona Artêşa Azad de roj bi roj rewşa Artêşa Azad xirabtir bû û her car jî rastî têkçûyîneke mezintir dihat.

Li gorî hin çavkaniyên din jî, rejîma Baas xwedî rolekî sereke di avakirina çeteyên DAIŞ û El Nûsrayê de bû û ev yek bi hevkariya PDK`ê pêk hat û bi taybet li ser rêya Mela Kirekar da ku YPG û Artêşa Azad bên derbkirin.

Her wiha di nava 6 salên şoreşa Sûriyeyê de, rejîmê tu kesên ku cihê xwe di komên alîgirên Hewlêrê de digirin, binçav nekirine tevî ku piraniya wan hîna karmend in û mûçeyên xwe yên mehane digirin. Her wiha rejîma Baas di demeke ku buroyên kanalên El Cezîre û El Erebî hatin girtin de rûxseta kar da Kanala Rûdawê!

Piştî têkçûna Artêşa Azad, Cîgirê Hikumeta Başûr Azad Berwarî serdana Şamê kir û bi rejîmê re li hev kir ku PYD'ê lewaz bikin. Ev yek jî ji ber ku Rêveberiya Xweser rê neda sandiqên hilbijartinê yên rêjîmê ku li herêmên wê bên danîn.

Dîsa bi armanca destekdayîna hilbijartinên serokomariya Sûriyeyê û tehrîkkirina gel ku beşdarî wê bibin û nêrîna xwe bidin û guh nedin biryarên rêveberiyê di 2014`an de, civîneke veşartî di navbera endamê Komîteya Siyasî ya Partiya Yekitî li Sûriyeyê Ebid El Semed û Elî Memlûk de li balafirgeha Şamê pêk hat.

Lê di wê demê de hêzên Asayîşê gelek sandiqên hilbijartinan ku bi awayekî veşartî derbasî herêmê bûbûn, girtin. Ev yek di çaxeke ku piştevanên Yekitiya Siyasî dengê xwe didan de pêk hat. Di heman demê de jî li başûrê Kurdistanê PDK`ê nehişt ku xwepêşandan li hemberî rêjîmê bên organîzekirin.



Her wiha rêjîmê heta niha jî planan datîne ku fesadiyê di nava gelê herêmê de şîn bike û di bin rûpoşa artêşa Dîfaî El Wetenî de êrîşî YPG`ê û YPJ`ê li Hesekê û Qamişloyê bike. Ev rastiyên hanê nîşaneyên herî berbiçav ên ji dijminahiya PDK`ê ji doza kurdî re û her wiha astengkirina wê ji lidarxistina Kongreya Neteweyî û çareserkirina doza kurdî li çar parçeyên Kurdistanê re ye.

www.arsivakurd.org

## Hunermendê gelan Aram Tîgran

**MALBATA HUNERMENDÊ** nemir Aram Tîgran jî wekî bi hezaran malbatên ermenî ji ber polîtîkayên qirkirinê yên dewleta tirk ji Amedê koçî bajarê Qamişloyê yê rojavayê Kurdistanê kir. Hunermend Tîgran di 15'ê çileya 1934'an de li bajarê Qamişloyê hat dinê. Tîgran di tevahiya jiyana xwe de her dem ji bo biratiya gelan hunereke qedîm afirand û her dem wek dildarekî doza Kurdistanê piştgirî da têkoşîna Azadiya Gelê Kurdistanê. Tîgran gelek albumên binirx ên wek 'Gelê kurd dest bidin destê hev', 'Evîna Feqiyê Teyran' û hwd. derxistin. Gelek albumên wî ji hêla KOM Muzîk, Aydin Muzîk û Ses Mediayê ve hatin çapkirin. Tîgran di 6'ê Tebaxa 2009'an de ji ber nexweşiyeke kambax ji nav me koç kir. **AMED**



## Di 98'an de NÇM'a Amedê jî hatibû girtin

Polîtîkayên qirkirina çandî û fîzîkî yên dewleta tirk tu carî li dijî gelê kurd bi dawî nebûne û ev polîtîkayên faşîzan îro jî bi destê hikumeta AKP/Qesrê tên meşandin. Hikumeta tirk a di sala 1997'an de hat avakirin û heta 99'an di pêşengtiya Serokomar Suleman Demîrel û Serokwezîr Mesut Yilmaz de hat berdewamkirin, wek îro bi dehan saziyên kurd dan girtin. Di 14'ê çileya 1998'an de Navenda Çanda Mezopotamyayê (NÇM) ya Amedê jî hat girtin. Lê gelê kurd xebatên xwe dîsa nedan rawestandin. Di demên dawîn de jî gelek saziyên kurdan hatin girtin, hunermend û ciwanên kurd geh li HDP û DBP û geh jî li malan xebatên xwe didomînin. **AMED**



## 'Çekîm' derdikeve pêşberî temaşevanan

Lîstika şanoyê ya bi navê 'Çekîm' (Keşandin) dê di navbera 24 û 31'ê çileyê de roja derdikeve pêşberî temaşevanan. Lîstik di saet 20.30'an de dê li İkincîkat Tiyatroyê bê pêşandan. Lîstik balê dikişîne ser delodîniya xerckirinê ya ji salên 1990'î heta roja me ya îro û guhertinên bingehîn ên di civakê de derdixe pêşberî temaşevanan. Lîstik jiyana du xwişk û birayan ji zarokatiya wan de digire dest û heta ciwantiya wan tîne. Ev her du ciwan di nava demê de bi gelek tiştan re rû bi rû dimînin. Dîsa di lîstikê de jiyana trajîk a malbatê derdikeve pêş. **STENBOL**



# Helbestvanê kurd Şêx Rizayê Talebanî

**Helbestvanê kurd Şêx Rizayê Talebanî tu neheqiyê qebûl nake, dibe ku rayedarên dewletê bin û dibe ku xizmên wî bin lê tu carî gotina xwe lê venaşêre û peyva xwe ya herî giran ji bo neheqiyan bi kar tîne**

NAVENDA NÛÇEYAN

Şêx Rizayê Talebanî di helbestên xwe yên rexneyî de gotin û peyvên herî mustehcen bi kar anîne. Çi rayedarên hikumetê û çi jî mirovên wî bi xwe bin, kê neheqî yan xetayek li dijî wî yan jî li dijî gel kiribe, Şêx Riza bi hîcîv û rexneyên xwe çûye ser wan.

Şêx Rizayê Talebanî kurê Şêx Evdirehman Talebanî ye. Di sala 1835'an de li hêla Kerkûkê li Qirixê hatiye dinê. Pêşî li ber destê bavê xwe xwendiye. Paşê ji bo xwendinê çûye Kerkûk, Koye û Silêmaniyê.

Şêx Riza di sala 1860'an de diçe Helebê, paşê diçe Stenbolê. Du salan li Stenbolê dimîne, piştre vedigere Kerkûkê. Piştî ku bavê wî dimire ji Kerkûkê diçe bajarê Koyê cem apê xwe Şêx Xefûr. Tê gotin ku apê wî soz daye wî ku keça xwe bide Şêx Riza, lê paşê nadê. Şêx Riza jî li ser vê yekê diqehire û ji Koyê diçe Kerkûkê û dest bi helbestan dike û li ser apê xwe dinivîse.

Şêx Riza di sala 1866'an de derbasî bakurê Kurdistanê jî dibe û tê Erziromê, li wir jî dîsa derbasî Stenbolê dibe. Çi li Stenbolê be û çi jî li derdorên padîşah be, di demeke kurt de nav û dengê wî belav dibe. Şêx Riza nêzî 8 salan li Stenbolê dimîne. Paşê di sala 1874'an de vedigere Kerkûkê. Piştre ji karbidestên Kerkûkê û ji hin malbatên mezin û şêx û axayên Kerkûkê diqehire, ji Kerkûkê bar dike û diçe Bexdayê. Heta ji bo vê yekê di helbesteke xwe de wiha dibêje:

*Bem hale eger def'eytir*
*biçime Kerkûk*
*Me'lûm e be merdî neri-*
*wawe le serim tûk.*

Dîsa di rêzikeke helbesteke xwe de, ji Şêx Hesen re wiha dibeje:

*Bo kerî îlan-î herb kird*
*legel min Şêx Hesen*
*Seyrîken yaran çi gob-*
*endêkî gêrra em kere.*

Şêx Riza, Şukrî Fezlî û Cemîl Siddîq Zehawî çi bi erebî û çi jî bi kurdî gelek hîcîv li ser hev nivîsîne. Tê gotin ku Şêx Riza welê li ser wan nivîsîye ku êdî her du şairan jî ji ber Şêx Riza pes kiriye.

Şêx Rizayê Talebanî di 13 çileya 1909'an de di 74 saliya xwe de li Bexdayê wefat dike. Wî li Bexdayê nêzîkî mezelê Evdilqadirê Geylanî vedişêrin. Şêx Rizayê Talebanî bi kurdî, farisî, erebî û tirkî helbest nivîsîne. Ev helbestên wî hemû wek dîwan cara pêşîn di sala 1935'an de li Bexdayê hatine çapkirin.



## Fatima Îsa di rojeke çileyê de koç kiribû

NAVENDA NÛÇEYAN

Tenê kurdên Sovyetê Fatima Îsa nas nakin, hema bêje li tevahiya Kurdistanê Fatima Îsa tê naskirin. Bi dehan sal e navê vê dengbêja kurd ji hêla gelê kurd ve tê zanîn û wê jî wek bi dehan dengbêjan navê xwe bi tîpên zêrîn li dîroka hunermendên kurd da nivîsandin. Fatima Îsa bi kilama 'Miho' di nav gelê kurd de hat naskirin.

Bêguman hunermendên mêr ji bo hunera xwe di nava civakê de bi pêş bixin, ji derveyî dewletan tu kes li hemberî wan nabe asteng. Lê karê hunermendiyê ji bo jinên hunermend ne karekî hêsan e, ji derveyî zext û pêkutiyên dewletan, zextên malbat, mêr, derdorê jî gelek caran derdikevin pêşberî hunermendên jin. Fatima Îsa, Eyşe Şan û gelek hunermendên jin ên kurdistanî li hemberî hemû pêkutî û zextan jî wan hunera xwe bi pêş xist û di çanda gelan de bûn xwedî kedeke pîroz.

Fatima Îsa xwedî dengekî zîz bû. Gava ew kilama 'Miho' distrê, hemû laşê mirov dilerize. Lewre jî strana 'Miho' ji bîra guhdaran tu caran naçe.

Fatima Îsa di sala 1934'an de li gundê Erezdeyanê yê Ermenistanê hatiye dinê. Ev herêm wek navçeya Vêdiyê tê nasîn û keça Îsayê Ûsivê Elo ye. Îsa bi xwe ji eşîra qerka ye. Ev eşîr beşeke êla birûkiyan ye. Navê gundê wan ê li Ermenistanê hatiye guhastin û kirine Yêrasxavan, navê navçeyê jî kirine Ararat. Ew gund weke 50 kîlometreyan dûrî Yerêvanê, li hêla başûrê rojhilat dikeve.

Zarokatiya Fatima Îsa wekî ya hemû kurdên Sovyetê, di salên 30'î de di nava zehmetiyên mezin de derbas dibe. Di sala 1937'an de, ku di dîrokê de ev sal wek sala tundiyên Stalîn tê zanîn, gelek neteweyên li Qafqasyayê dimînin, dîsa gelek kurdên misilman, êzîdî û gelên cuda sirgûnî Asyaya Navîn û Kazakistanê tên kirin. Kurdên misilman li Ermenistanê zêdetir, li nêzî sînorê bakurê Kurdistanê diman. Armanca sirgûnkirina wan a jî ew bû ku xwedêgiravî girêdana kurdên Sovyetê û yên bakurê Kurdistanê bi hev re heye.

Di dawiya salên 80'yî û destpêka salên 90'î de rewşa aborî, sîyasî û civakî ya herêmên Qafqasyayê xirab bû. Sed mixabin, di navbera neteweyan de jî dilsarî bi pêş ket. Gelek kurdên misilman û êzîdî ji Ermenistanê û Gurcistanê derketin, çûne Rûsya, Ûkrayna, Kazakistan û welatên Ewropayê. Malbata Fatima Îsa jî tevî mirovên xwe yên ji êla birûkan û celaliyan di sala 1989'an de koçber bûn, çûne Rûsyayê, li herêma Krasnodarê, li navçeya Korênovskê, li bajarokê Platnîrovskê (ew bajarekî biçûk e, 17 hezar nifûsa wê heye, 50 kîlometreyan dûrî bajarê Krasnodarê, li ser rêya Krasnodar û Rostovê ye. Di vî bajarokî de bi qasî 200 malên kurdan hene, nêzikî hezar kes lê dijîn). Fatima Îsa li vir bi malbata xwe re dima.

Xwişk û birayên Fatimayê jî hene. Lê ew ji dayikê ne, ne ji bav. Navê birayê wê Fadil, navê xwişka wê Bacxanim e. Fatima Îsa di 15'ê çileya 2010'an de ji ber nexweşiya dil di 76 saliya xwe de çû ser dilovaniya xwe. Tirba wê li vê derê ye, di nav mexbera kurdan de hatiye veşartin.



## Îsal eleqe tune ye





10'emîn Fûara Pirtûkan a TUYAP'ê ya Edeneyê, bi hevkariya Yekitiya Weşanxaneyên Tirkiyeyê di 7'ê çileyê de dest pê kir. Li gel ku hefteyek derbas bû jî fûara pirtûkan zêde rastî eleqeyeke germ nayê. Li qada fûarê bi hinceta OHAL û êrîşên bombeyî polîsan ewlehiyeke gelekî mezin girtiye û li her derê polîs hene. Ji ber zêdebûna polîsan zêde welatî naçin fûarê.

Nivîskarê Weşanxaneya Selê Hamît Erdem diyar kir ku hemû weşanxaneyên beşdarî fûarê bûne hêj mesrefên xwe dernexistine û eleqe tune ye. Erdem anî ziman ku ji ber tedbîrên zêde welatî bi fikar tên fûarê û ev yek bandoreke xirab li ser eleqeya li hemberî pirtûkan dike.

Nivîskar Nevîn Berktaş jî anî ziman ku ji ber zêdebûna ewlehiye kes eleqeyê nîşanî fûara pirtûkan nade û wiha got: "Gelek mirov ji ber tirsê nayên fûarê. Yên tên jî bi tirs tên." **EDENE - DÎHABER**

www.arsivakurdi.org

# Yo ke gina behrî ro xo bi mar gêno

ŞEYDA ASMÎN

Serê koyê Şengalî de cuyîyayîş qet rehet nîyo. Xeylê zor o. Maneno cuya gerîla. Mabênê cuya gerîla û serê koyê Şengalî de zaf ferqe çîn a. Şengalijî serê koyê Şengalî de şert û mercanê cuye ya girane de cuyenê. Îmkanî zaf şenik ê.

Nika kî zimistan o. Zimistanê koyan cîya yo. Zimistanê xo raşt zimistan o. Qet leqa xo çîn a. Tawo ke êno tam êno. Mordem heta zereyê astikanê xo hîs keno. Mezgê astikanê mordemî cemedîno. Çend roje yo koyê Şengalî de zimistanî xo tam musna ma. Heqa xo ya heta aşma Mijdare kî wext da ma. Va: Tedarîkê xo bicêrê. Va: Eke ez bêrî xirab êna. Ma zaf goşnêkuyapa. O kî ame yewa henêne nayê binê goşê ma ra ke. Va: Ha şima rê şima goşnêkuyenêpa ha. De weş o!

Êê pey na şamare ma amayme bi xo. Senî ke va û vartîşê Koyê Şengalî vinet ma kî dest bi ci kerd. Ma hîrê çar embazîme. Va û vartîş vineto la xezika mevinetênê. Çûnke serdode henên esto ke destê ma nêcêne ke ma bigurîme. Rind o kulindade ma esta, ma xo erzenîme virana aye xo tayê keme germ reyna ême ser karî. Ma heta perojî xoverro da. Ma vêşanîme. Kebanîya ma Xezale ma rê werd kerdo hazir. Senî ke aye va:

-Heval no werd hazir o.

Ma pêro pawayê ci bîme, senî ke ma nê vateyî heşnayî ma ca de kar caverda ma xo êşt zereyê kulinda germine. Destê ma bîyê sung û siya. Fişfişa ma ya. Ti vana qey koroya fiş fişaya. Derdê ma werdî ra zîyaderî germ o. Ma pêro pîya dormeyê sobayê de kom bîme. Ma hîna dest bi werdînê kerdbî dayika Kine çêverê kulinda ma ra asaye. Û bi vengê xo yê geşê her demî va:

-Ma bi xêr dî.

Ma pêro pîya bi heman germinîye cewabê aye da:

-Xêr bi silamet daka Kinê.

Ma masaya werdî ser o ca musna aye. A ke nîşte ro ma kî reyna nîştîme ro. Zerreyê çimanê daka Kine yê keskan huyeno. Çimê keskî û rûyo qemer kî çiqas şîkîyenê yewbînî. Senî ke wazenê vajê tu manayê xemî, derd û kulan, bêhêvîye çîn o. Wext wextê hêvî viraştişî yo. Hêvîyê kenê vila. Nê dem û dewranî de jîhatîbûnade zaf giranbuha ya. Her kes nêşkîno. Ci rê şoreşger bîyene gerek a. Na het ra qet qusur çîn o daka Kine şoreşger a.

Cayê ma germ o. Pey hende cemîdîyene ma bîme germ. Laşa ma bîya sist. Ma hem werd weme hem qisey keme. Xoşebera daka Kineyê kî xoşeber a hanê. Ti vana fek ra hemgimen herekîyeno. Weş qisey kena. Tawo ke qisey kena mordem ci ra çîyan museno. Tawo ke qala çîyanê kanan kena zaf weş a mi şono. Daka Kine qet nêwendo la a kamil a. Cuye wenda û bîya kamile.

Ma ke nata bota tayê qisey kerd, vate ame ser halê êzidiyan. Xora pêro munaqaşeyê siyasî ser rewşa Şengal û şengalijanê. Her embazêk çîyê va. Heta a vîste daka Kine bêveng goşnayêne munaqaşeyan ser o. Tayê ke nîya goş na ser vate guret û va:

-Şima zanenê halê zaferîyê şengalijanê ma no yo; ginayê behrî ro xo bi mar gureto. Mar roje be roje înan jahr keno. Derba mergî çi taw pirodo kifş nîyo.

Ma pêro bêveng û bêvaj mendîme.





# Paytextê Tenyayîye

**Tam a vîste de, mi o çîyo ke heta nika caran mi vîrî ra nêşîyo dî. Mi dî kênekadê fistansipîya porderga warwaye, Hênîyê Qicî ver o vinderta, ma ro seyr kena. Aye seke ma dîyîme, xo eşt çala hênîyî û binê hakokoyî ra vîndî bîye şîye**

UGUR SERMÎYAN

Ez o taw ses serrî bîya. Ma dewadê Xozatî de weşîya xo ramitêne. Ez û waya mi, ma domanîya xo de may û pîyê xo ra zafêr pîrika xo ser o hec bîme, ma aye ra nêvişîyêne. Keyeyê ma sixletîye bî. Maya ma kî axirî zê ma domane bîye û veyvikîye kerdêne. Ma maye nêzanitêne, pîrika xo zanitêne. A bişîyêne kotî, ma zê dimoçî aye dime ra bîme. A şîyêne verê malî şiwanîye kerdêne, ma leyê aye de bîme, ci rê mal çarnêne. A şîyêne kolî dayêne arê ardêne, min û waya xo kî tey pezikî derze kerdêne. A şîyêne juyêna dewe meymanîye, ma berbêne, ma kî bîyêne meyman.

O wext dewî hende nikayî rehet nêbîyî. Yê zafê keyeyan serê banî çatî nêbî, herre bî. Owike zereyê keyeyan de çîn bîye. Dewa ma de di-hîrê cayan de hênî estbîyî, la hem awa înan kêmî bîye hem kî e viraştî nêbîyî. Zafane ma şîyêne bîdonan a ê hênîyan ra awe kirişnêne ardêne. Seba ke awa înan kêmî bîye, heta ke bîdonê ma bîyêne pîrr, ma êndî taciz bîyêne. Pîlanê ma awa serdine vatêne, zobîna tabayê nêvatêne.

Rojadê hamnanî ya germe bîye. Peroj pîrika mi mi ra va "Lacê mi nêsono mi rê Hênîyê Qicî ra tenê owika serdine nêano?" Seba ke germê hamnanî û yê perojî nîştîbî pêser, mi nêwaştêne şêrî. Mi va "Ez teyna nêson." Aye xuya mi zanitêne, coka na rey waya mi ra va "Kênaya min a rindeke nika deqê de sona, mi rê firrê owika serdine ana. Henî nîyo?" Waya mi zî gêre ra aye ser, va "Nenê, kutikê çêyê Kenanê Birayî esto, ercîno mi. Ez terson." Teselîya aye ke ma ra kute, aye bîdonî kerdî xo dest û kute raya Hênîyê Qicî. Ma a caran bê ma şîkîna şêro cayê? Ma kî zê çêlikanê pisînge kewtîme aye dima.

Hênîyo Qic hetê mezraya Xeliqan de, fekê ju dereyî de bî. Viraşte nêbî, dewijan çalê kinitebî, awe hêdî-hêdî amêne, bîyêne gole. Awa xo hende serdine bîye ke merdimî ke şimite, didananê merdimî halên bîyêne. Derûdorê xo bi daranê vîyal û qawaxan a seke çepernaybî. Coka tîje zaf nêguretêne. Germê perojî ver der û cîran pêro ancîyaybî keyeyanê xo, qulêdê Heqî teber ra çîne bî. Ma kîşta baxçeyê Silî ra vêrdîme ra, axbînî ro şîme. Mabênê axbîn û hênîyî de "mamuxî" estbîy. Ma seba mamuxan veşten a pîrika xo ra vêrdîme ra, tayê mamuxê tirşe zê axûyî kerdî û werdî. Êndî wexto ke pîrika ma ameye reşte ma, reyna kutîme rêçe û ver bi hênîyî çîv da.

Tam a vîste de, mi o çîyo ke heta nika caran mi vîrî ra nêşîyo dî. Mi dî kênekadê fistansipîya porderga warwaye, Hênîyê Qicî ver o vinderta, ma ro seyr kena. Aye seke ma dîyîme, xo eşt çala hênîyî û binê hakokoyî (kemera hênîyî) ra vîndî bîye şîye. Ez mat mendbîya. Ez ke heşîya xo, pîrika mi milmilnêne "Bisimlayî, bisimlayî, Ya Xizir!". A bîbî kelebermîye, hurik-murikê dormeyê hênîyî kerdêne pak. Rew-rew keleyê xo kemera hênîyî ra birnêne. Waya mi kî tersabî, çimê aye bîbî beloqî. Xof nîştîbî ma ro. Aye bi vengêdê lerzokî va "Bira, o çik bî?"

Xafil de vengê camêrdêkî ez nê hewnî ra werezno ra. Mi dî derezayê kalikê mi Hesê Kekoyî veng dano: "Veyvê! Erê veyvê! Erê to dîye? N'erê to a dîye, nêdîye?" Pîrika mi reyna dest bi berbisî kerd, bi zor a veng fît xo: "Ya bira, ya!" Seke reşt ma, bi heyecan dest bi qeseyî kerd. Helkejîyêne: "Ez amo ke mayîne biancî şuye, mi dî heywane têsan a. Mi va bîyarî hênîyî ser wa awe boro. Pîyê min ê rametî tim vatêne milaketa nê hênîyî çênekadê azêb a, ma huyêne. Dema raşt bîyo. Hey ya Heqo Teala Hezîretê Elî!" Pîrika mi guçikê leçega xo ya çimê xo esternayî û va "Ez şêrî keye, nîyaz pocî, san de bîyarî. Tenê çile-mileyan kî cifîme. Ez qurbanê rahma ey bî!"

Mi kî çuyê guretbî destê xo, mi kerdêne qulika hênîyî ke wa a kêneke zereyê hênîyî ra bivecîyo. Mi zereyê xo de fikirîyêne "Tirêm (gelo) a çiton kewte na qulike?" Ez bi vengê pîrika xo ya tîlê serê xo bîya "Oxiro! Sebê! Bêrê mi resê!" Ma reyna zê verekanê sawîyan kewtîme aye dima. Ma ke reştîme ci, destê juyî de mi guret yê bînî de waya mi girewt. Mi va "Nenê, a senê zereyê a qulike de manena? Seba ke lambaya aye çin a, ti wazena çileyan bivirazê?" A huyaye û va "Ma ke çileyan mefîme ci, nîyaz mepocîmê mîyarîme, a ma ra miradîna. O wext ma caverdena sona, awa ma kî ancîna bena ziwa." A roje ra pey heta nika, ez çi taw bişîyêne ê hênîyî ser, xofê a kêneka azêbe zerrîya mi de bî. Mi ke destê xo dergê a golike kerdêne ke awe bişimî, mi vatêne qey a do bajîyê mi ro bo, mi bianco zereyê hênîyî.

Par nê pêrar, ez hamnanî ancîna dewe de bîya, hetê hênîyî ser şîya. Ez şîya ke aye ra vajî, êndî to ra nêtersena ez. Dewê ma ameyî veşnayene, welatê ma bîyo talan. Şaristananê xerîban de xirabîya ke nêbîye, ma dîye. Mino ke ci ra bivatêne mi fam kerdo ke keso tewr peyêno ke ganî ez ci ra bitersî, ti ya, la a çîne bîye. A kî şîbî. Hênîyê Qicî ra vengê awe û boya honikîye nêameyêne. Palax û pusê zerdî rê bîbî doşege.

Ez nîşta ro, îştîrî çimanê mi ra war bîyî, ameyî. Tenya mordemî ney, milaketî kî welatî ra şîyê. Êndî no bajar bîyo paytextê tenyayîye. Mi waşt ke vajî keyeyê înan biveşo ke înan ma bêwar, ti tenya û zar verdayî. Mi zî waşt zê aye û zê pîrika xo, xo binê herre kerî. Mi kî waşt zê înan herra welatê xo de vîndî bî…

**No nuşte keyepelê Dêrsiminfo ra ameyo guretene*

www.arsivakurd.org

## ‘Ma ver bi adirî kirancîyenî’

NECLA DEMÎR / STENBOL - DÎHABER


Teşebusê derbe ra dima bi îlankerdişê rewşa îstîsnayî (OHAL) xeylê neheqîyî ameyî kerdiş. Tepiştiş, tewqîfkerdiş, kiştiş û karî ra dûrîvistiş û sewbîna. 15ê temuze ra nata Tirkîya de hem hetê sîyasî û hem zî hetê ekonomîk de krîzêko gird yeno cuyayîş.

Serekê MAZLUMDERî yo kehen û Verfekê Platformê Aştî ya Kocaelî Dr. Omer Faruk Gergerlîogluyo ke bi Qerarnameyê Hukmê Qanûnî wezîfe ra amebî îxraçkerdiş, derheqê tehlukeyê ke vernîya Tirkîya de yî de qisey kerd.

Gergerlîogluyî va ‘Tirkîya ver bi aramî û başî ra nêşona’ û qiseykerdişê xo wina domna: “Wazenî komara tersî awan bikerî. Cok ra bi polîtîkayanê xo heme muxalîfan kenî hedef. Nika mîyanê komelî de kaos û krîzêko gird esto. Serra 2016 de hêriş û kiştişî vejîyayî duştê tewr berz. Tirkîya hetê ehlaq, huqûq, heqê merdiman û sîyasetê demokratîke de têk şîya.”

**PIŞTÎDAYÎŞÊ SEBA ERDOGANÎ KÊMÎ BENO**

Gergerlîogluyî dewamê qiseykerdişê xo de dîyar kerd ke ‘her çiqas ke tersêko gird ameyo awankediş zî piştîdayîşê ke seba Erdoganî yenî dayîş, sey cemedî roj bi roje helîyenî’ û qiseykerdişê xo wina domna: “Hukmat û Îdarekarê Tirkîya komelî ver bi adirî kirancenî. Ganî qanûno bingeyî sey peymanê komelî bibo. Fotografo ke meclîs de vejîya zaf lêmin o. Munaqeşeyê ke bê HDPyî yenî kerdiş, ti manaya înan çin a. AKP û MHP bîyî yewe û polîtîkayê zext û hêrişan tercîh kerdî. Nê 30 serrî yo ke nê polîtîkayî yenî cerebnayîş, la heta nika ti netîce nêameyo girewtiş. Wazenî Erdoganî bikerî Serekdewlet, la no felaket o.”



**GANÎ MA HÎNA ZÊDE HEWL BIDÎ**

Gergerlîogluyî peynîya qiseykerdişê xo de wina va: “Seba aştî, edalet, waye û biratîya komelî hîna zafêr xebate û fedakarî lazim o. Ma sey Platformê Aştî yê Kocaelî şer û çareserî ser de cigêrayîşan kenî. Netîce de do bêro famkerdiş ke ma çiqas heqdar î. Qîrayîş û serewedaritişê dayîkan eşkeno vernîya kaos û tehlukeyan bigiro. Cok ra ganî qîrayîşê dayîkê tirk û kurdan bibo yewe.”


# Ganî ma aqilêko ortax awan bikerî

**Serekê Pêroyî yê OSPyî Sînan Çîftyurekî bale ant muhîmîya Kongreya Neteweyî ya Kurde ser û wina va: “Nika wext wextê wayîrvejîyayîşê her çar parçeyê Kurdistanî yo û ganî ma nê firsendî nêremnî”**

FERÎT DERE / ANQARA - DÎHABER

Serekê Pêroyî yê Partîya Azadî û Sosyalîste (OSP) Sînan Çîftyurekî derheqê Kongreya Neteweyî ya Kurde û averşîyayîşê peyên de qisey kerd û vînayişê xo ard ziwan.

Çîftyurekî va ‘nika kurdî prosesêko giran ra derbaz benî’ û qiseykerdişê xo wina domna: “Senî ke dagîrkeran Kurdistan kerdbî çar parçe, ewro zî wazenî mezgê kurdan parçe bikerî. Mezgê kurdan parçe nêbeno û ganî rêxistinê kurdan bibî yewe û firsendê parçekerdişî nêdî yê ke wazenî mezgê kurdan parçe bikerî.”



**ÇARESER BENÎ**

Çîftyurekî dewamê qiseykerdişê xo de bale ant yewîye û wina va: “Eke hetê aqilî de yewîye bêro viraştiş, ti problem orte de nêmaneno. Bi serran o şarê kurd bi her hawayî têkoşînê azadî dano meşnayîş û heta nika xeylê bedelî zî ameyî dayîş. Nê bedelî do bibî sedemê azadîya şarê kurdî. Nika wext wextê yewîyeyêka xurt a. Eke partî û rêxistinê kurdan bibî yewe o wext do welatê xo azade bikerî. Cok ra ganî ma aqilêko ortax awan bikerî.”

**GAMÊ ORTAXÎ**

Çîftyurekî qiseykerdişê xo de va ‘seba yewîyeyêka xurt ganî çar parçeyê Kurdistanî de gamê ortaxî bêrî eştiş’ û qiseykerdişê xo rê wina dewam kerd: “Nê 2 serrî yo ke vera şarê kurdî de şerêko taybet ameyêne meşnayîş. Labelê nê prosesê şerî de şarê kurd yewîya xo nîşanê heme şaran da. Cok ra ganî êdî sîyaset, rêxistin û partîyê kurdan bibî yewe û no firsendêko vejîyayo orte ra feyde bivînî. Eke yewîya kurdan bivirazîyo, o wext do bêro dîyayîş ke na yewîye do seba heme şaran bibo sedemê aramî.”

**ROJA YEWÎYE YA**

Çîftyurekî qiseykerdişê xo bi no hawa qedêna: “Eke Kongreya Neteweyî her çar parçeyê Kurdistanî de bêra viraştiş û partî û rêxistinê ma bêrî têhet, o wext do demokrasî zî xo reyde bîyaro. Êdî hêzê sîyasetê kurd hetê heme cîhanî ra yeno qebulkerdiş û yeno şinasnayîş. Ganî ma mîyanê xo de têkilîya xo yewbînan reyde xurt bikerî. Kongreya Neteweyî do seba ameyoxa sîyasetê kurd bibo gamêka muhîme. Ez yewna rey vana ke firsendê ke nika kewtî destê ma, ganî ma seba menfîetê xo bixebetnî. Ewro roje roja yewîya Kurdistanî ya. Ma do destê xo bidî yewbînan û seba ameyoxa şarê xo ma do qerarê azadî bidî.”



# ‘Ez do heyfê Rojhatî bigira’

Z.NERGÎZ BOTAN / DÎDAR KATO / BEHDÎNAN - ANF

Gerîlaya YJA Starî Ezda Rojhate, Colemêrg de yena dinya. Gerîla Rojhate bi serran polîtîkayanê faşîst yê dewleta tirk reyde rî bi rî manena û nê polîtîkayî benî sebeb ke Rojhate beşdarê PKKyî biba.

Gerîla Ezda Rojhate qala cuyayîşê xo kerde.

Ezdaya ke bi şehadetê gerîlayê HPGyî Rojhatî ra tesîr bena û beşdarê gerîla bena, wina vana: “Tesîrêko cîya yê embazê Rojhatî ser mi de estbî. Embaz Rojhatî wexto ke waştêne ke çalakî bivirazo, hetê dişmenî ra amebî ferqkerdiş. Dima dişmenî gule Rojhatî ser de reşanabî, her çiqas ke 3 guleyî embazê Rojhatî ginaybî zî Rojhat nêkewtbî. Polîsî dormeyê cenaze girewtbî û îşkenceyê cenaze kerdênê. A vîste de ez seba ke heyfê ey bigira, mi xo bi xo soz dabî. Tena mi nê, zafane ciwanê ke ê wehşetî dîybî, beşdarê gerîla bîyî.”

**PKK MERDIMÎ GANÎ KENO**

Gerîla Ezda Rojhate dewamê qiseykerdişê xo de va ‘wexto ke ez mîyanê sîstemî de bîya, mi mekteb wendêne’ û qiseykerdişdişê xo wina domnaye: “Wexto ke ez beşdarê PKK bîya, mi fam kerd ke mektebê dewlete ser ma de polîtîkayê asîmîlasyonî meşnenî. Nika ez tîya de ya û wexto ke ez xo ra ewnîyena, ez vînena ke xeylê bedilîyayîşî mi de virazîyayî. Ez tarîx û kulturê xo musaya û ya tewr muhîm zî ez sey cinîyêk bîya wayîrê îradeyêko gird. PKK îradeya merdimî newe ra xelq keno.”

**EZ ŞOPA AYE DE ŞONA**

Gerîla Ezda Rojhate peynîya qiseykerdişê xo de va ‘seba ke ez beşdarê PKKyî bîya, xo bişans hîs kena’ û qiseykerdişê xo wina qedênaye: “Îxtîmal estbî ke ez zî sey ciwanê ke mîyanê sîstemî de helîyênî ra yewe bibîyêne. Ez wazena wa heme ciwanî beşdarê gerîla bibî. Mi soz dayo heme şehîdan. Bitaybetî mi soz dabî Şehît Sara (Sakîne Cansize) û ez do rayîrê Saraye de şêra.”

# Cenazeya dayîka Emame ameye definkerdiş



Dayîka Emame ya 75 serreyî wextê xoverdayîşê Cizîrî de keyeyê xo nêterik-naybî û hetê polîsanê dewlete ra bi mêrdeyê xo Mehmet reyde keyeyê xo de ameybî înfazkerdiş û dima ra polîsan gîştreyê aye destê aye ra vetbî.

Badê ke cenazeyê dayîka Emame û Mehmetî ameyî dîyayîş, neqlê Nêweşxaneyê Dewlete yê Şirnexî bibî. Karê otopsî ra dima her di cenazeyî zî hetê bi hezaran kesî ra ameyî definkerdiş. Parlamenterê HDPyî Tugba Hezere û Leyla Birlike, îdarekarê HDP û DBPyî, temsîlkarê rêxistinê sîvîlî û bi hezaran kesî beşdarê merasîmê cenazeyî bîyî. Cenaze bi flamayê keske, sûr û zerdan ameye xemilnayîş û ser milê bi hezaran kesan de morgê nêweşxane ra ver bi Goristanê Nalaru ameye kiriştiş. Bi hezaran kesî sloganê ‘Zextî nêeşkenî sere bi ma bidî ronayîş’, ‘Dewleta qatil do hesab bida’ ameyî eştiş. *ŞIRNEX - ŞÛJIN*

# Nimûneya rojnamegerîyêka aştî: Neynik

Platformê rojnamegerî Neyniko ke par bi siloganê ‘hetê aştî ra xebere’ hetê rojnamegerê ke keyepel û rojnamegeranê cîya-cîyayan de xebetîyenî ra amebî awankerdiş, ewro ameyo duştêko bi hezaran kesî taqîp bikerî. Neynik kurdî de yeno manaya ‘neynike’ (eyne) û hewl dano ke rojnamegerîyêko aştî bivirazo. Cok ra merdim eşkeno keyepelê Neynikî de bireso xebatanê winasîyan. Keyepelê Neynikî de rîpela Kolombîya esta û aye rîpele de prosesê aştîye yê Kolombîya yeno vatiş. Reyna keyepel ser de modelê Srî Lanka, Arjantîn û Tunusî zî estî.

Edîtoranê Neynikî ra Enîse Askine va ‘hedefê Neynikî o yo ke nimûneyê têkoşînê ke seba aştî yenî dayîş taqîp bikero û seba rojnamegerîya aştî teşwîq bikero’ û qiseykerdişê xo wina domnaye: “Neynik lazimîya aştî ra ameyo awankerdiş. Ekîba Neynikî de cayê her kesî cîya yo, labelê hedefo ortax yê her kesî piştîdayîşê aştî yo. Averşîyayîşê rojnamegerîya aştî, girêdayeyê xebetnayîşê însîyatîfê aştî yê rojnamegeran, o zî girêdayeyê azadbîyayîş û xoserbîyayîşê medya yo. Tirkîya ya ke nika tede 145 rojnamegerê tewqîfkerde, 157 sazîyê weşanî yê morkerde û 9 hezar rojnamegerî zî tewqîfkerde yî, merdim nêeşkeno qala azadî û xoserîya medya bikero.” *AMED - ŞÛJIN*






www.arsivakurdi.org

ROJEVA Medya
16 Çile Duşem 2017


ROJEVA MEDYA
Ararat Basın - Yayın
Reklamcılık Adına


İmtiyaz Sahibi:
Murat SEKMEN

Yazı İşleri Müdürü:
Mehmet Çetin ALTUN
*Yönetim Yeri:* Kooperatifler Mahallesi Akkoyunlu 4. Sokak Sarıca Apt. 2/3 *Yenişehir-DİYARBAKIR*

*Tel:* 0 (412) 224 35 93
Baskı *(ÇAP):*
*İstanbul:* Gün Matbaacılık, Reklam, Film, Basım, Yayın, Tan. San. Tic. Ltd. Şti. Telsizler Mevkii Beşyol Mah.
Akasya Sok. *No:* 23/A *Küçükçekmece İSTANBUL*
*Tel:* 0 (212) 580 63 81
*Adana:* Arslan Güneydogu Gazetecilik, Matbaacilik, Kağıtçılık
Yeni Doğan Mah. 2108 Sok. *No:*13/A *Yüreğir / ADANA*
*Tel:*0 (322) 346 03 71-72
Yaygın Süreli Yayın
*e mail:*
rojevamedya@hotmail.com

# Sûr vê carê bi OHAL'ê tê talankirin







HULYA EMEÇ / AMED - ANF

Ev salek e navçeya Sûrê ya Amedê bi hinceta qedexeya derketina derve tê xerakirin û talankirin. Li vê navçeyê ku li 6 taxên wê "qedexeya derketina derve" dewam dike, 40 hezar mirov bê mal man û xaniyên wan ji holê hatin rakirin. Avahiyên dîrokî yên 300 salî ji binî ve hatin xerakirin. Pîştî vê xerakirin û talankirinê hikumetê têkildarî Sûrê bi lez û bez biryara 'îstimlaqê' dabû. Her wiha polîtîkaya hilweşandin û talanê ya dewleta tirk bandora xwe li ser Geliyê Dîcle û Baxçeyên Hewselê yên 8 hezar salî yên ku ji aliyê UNESCO'yê ve di nav lîsteya Mîrateyên Çanda Cîhanê de hatin bicihkirin jî kir. Niha jî Geliyê Dîcle û Bexçeyên Hewselê ji aliyê Wezareta Hawirdor û Bajarvaniyê ve wek "Qada Projeya Taybet" hat ragihandin. Lê belê li ser vê projeyê agahî ji kesî re nayên dayîn. Projeya ku di 28'ê kanûna 2016'an de hat erêkirin, diviyabû heta niha bihata aşkerakirin, lê belê tevî ku 18 roj di ser re derbas bûn jî hêj tê veşartin. Piştî erêkirina vê projeyê li hin cihên Baxçeyên Hewselê dar hatin birîn. Her wiha ne diyar e bê ev dever ji aliyê wezaretê ve bi çi rengî were bikaranîn.

> Geliyê Dîcle û Bexçeyên Hewselê ku di Lîsteya Mîrateyên Çanda Cîhanê de cih digirin, ji aliyê Wezareta Hawirdor û Bajarvaniyê ve wek "Qada Projeya Taybet" hat îlankirin û niha jî tên talankirin

Hevseroka Odeya Plansazên Bajêr a Amedê Buşra Cîzrelîogullari li ser projeyê axivî û anî ziman ku wan hîn li ser vê projeyê tu agahî peyda nekirine û wiha got: "Em nizanin bê kîjan qad wek qada projeya taybet hatiye ragihandin. Geliyê Dîcle û Bexçeyên Hewselê qadên gelekî berfireh in." Cîzrelîogullari destnîşan kir ku ji ber ku ew nikarin naveroka projeyê bi dest bixin nikarin xebateke teknîkî jî bimeşînin û ev tişt anî ziman: "Projeya ku hatiye erêkirin, divê ji raya giştî re bê ragihadin."


Cîzrelîogullari da zanîn ku wan ji Midûriyeta Bajêr a Hawirdor û Bajarvaniyê proje xwestiye, heke agahî ji wan re neyê dayîn ew ê îtîrazê bikin.

**'UNESCO BÊ DENG E'**

Cîzrelîogullari bal kişand ser bêdengiya UNESCO'yê li pêşberî vê projeyê û diyar kir ku ji bo UNESCO dest di vê xisarê werde, wan gelek caran serlêdan kirine, lê UNESCO bê deng maye. Cîzrelîogullari da xuyakirin ku UNESCO serlêdanên şexsî û saziyî qebûl nake û wiha domand: "Ji ber ku saziyeke navdewletî ye, bersiv ji serlêdanên me yên şexsî re nehat. Sûr bi qedera xwe re rû bi rû hatiye hiştin."

Cîzrelîogullari destnîşan kir ku beriya niha jî dewletê bi projeyên bi vî rengî xwestiye van deran tune bike lê bi hewldanên şaredarî û rêxistinên civakî hatiye astengkirin û wiha bi dawî kir: "Lê niha dewlet bi OHAL'ê dixwaze vê yekê bike."





## Malên Casê yên dîrokî BÊ XWEDÎ NE

Li Sêrtê, raçînga dîrokî ya piraniya Malên Casê ji ber bêeleqetiyê winda dibe. Malên dîrokî yên havînan hênik, zivistanan jî germ in, bi casê hatine çêkirin. Ev mal di şiklên pîramîdan de ne yanî ji jêr ber bi ber jor ve her ku diçin teng dibin. Casa li herêmê, bi kevirên kilsê yên li firinan tên şewitandin û hêrandin pêk tê. Li ser deriyên Malên Casê yek jê bi dengê xwe yê zîz û ya din qalind, du zingil hene. Fîgura destgirtî remza mêvanên mêr, fîgura destvekirî jî mêvanên jin nîşan dide. Bi vê taybetmendiya xwe, xwediyên malê fêm dikin ku mêvan jin e yan mêr e. Lê niha Malên Casê yên dîrokî ku di warê turîzma herêmî de xwedî cihekî girîng in, bi tunebûnê re rû bi rû mane. Her çend ji bo parastina van malan gelek hewldan çêbûbin jî niha bi rûxandinê re rû bi rû mane.



**SÊRT - DÎHABER**

# Heta niha rojek tenê hatiye parastin

MUJDAT CAN - NURÎ AKMAN / XARPÊT - DÎHABER


Dêra dîrokî ya piştî zayînê di sedsala 6'an de hat avakirin û 1400 sal emrê wê heye, ji ber ku bê xwedî hatiye hiştin û nayê parastin xera dibe. Dêra dîrokî Surp Kevork a li gundê Kulevank ê Xarpêtê hatiye avakirin li dijî hemû êrîşên mirovan hebûna xwe diparêze. Dêra dîrokî ku bi salan ji bo xwendekaran malovanî kir, piştî komkujiya ermeniyan a sala 1915'an leşkerên Alayên Hamidiyeyê lê bi cih bûn. Piştî ku leşker lê bi cih bûn ji aliyê leşkeran ve hate wêrankirin.

Dêra ku hewşa wê tijî darên mêweyê ye, di sala 1983'yan de bi awayekî fermî hat tescîlkirin û ket bin parastina dewletê. Lê piştî salên 1990'î ji ber ku dêr bê xwedî hat hiştin gelek derî û kevirên dêrê yên dîrokî ji aliyê defînegeran ve hatin dizî. Her wiha gelek kevir û tabletên li ser dîwaran jî hatin rakirin û şikandin û gorên di nav hewşa dêrê de jî bi hinceta tê de zêr hene ji aliyê defînegeran ve hatin talankirin.

Gundiyan diyar kir ku bi dehan caran hewş û hundirê dêrê ji aliyê defînegeran ve hatiye kolandin û dîwarên wê hatine xerakirin. Gundiyan anî ziman ku heta sala 1990'an li ser dîwarê dêrê fîgurên xaç, hesp û sembolên cuda hebûne lê hemû sembol hatine rakirin û dizîn.

Dêra ku hezar û 400 sal emrê wê heye heta niha tenê rojekê di 22'yê Hezîrana 2016'an de bi şerîteke têl hatiye parastin û piştî vê yekê dîsa bê xwedî hatiye hiştin.





## Teqîna yekbûyîna du stêrkan pêk tê

Komek mirovên stêrknas diyar kir ku di sala 2021-2023'an de cotek stêrk dê bibin yek û biteqin û di demeke kin de li ezmanan objeya herî geş biafirînin. Di pergala du stêrkên KIC 9832227 ku di sala 2013'an de hat lêkolîn kirin, hat tespîtkirin ku lezgînbûna stêrkan her ku diçe zêdetir dibe.

Zanyaran di civînên xwe yên salane yên American Astronomical Society de anî ziman ku dê ev yekbûyîn di nav 5 salan de pêk bê. Her wiha tê gotin ku dema yekbûyîna van stêrkên ku wekî 'Novaya Sor' jî tê binavkirin, piştî lêkolînan dê bê zelalkirin. Ji bilî vê yekê dê ev bûyera yekbûyînê li cîhanê jî bi awayekî zelal bê dîtin. **AMED**